ÇAND Û SINC

AMADEYÎ

3

2019/2020

AMADEKAR

Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Çand û sinc ve hatiye amadekirin.

LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.

NAVEROK

BEŞA 1 7

ÇAND Û SINCÊ NETEWE-DEWLET 8

Û TÊKÇÛNA SINC 8

ÇANDA NETEWE PERESTIYÊ 12

ÇANDA MALKIRINÊ 14

ÇANDA EZEZÎ Û TÊKÇÛNA SINCÊ CIVAKÎ 18

ÇANDA POPULER 20

ÇANDA SEKS, HUNER Û WERZÎŞÊ 23

ÇANDA SANAL 25

ÇANDA MEDYAYÊ Û EMPERYALÎZMA ÇANDÎ 27

BEŞA 2 31

SOSYALÎZMA ZANISTÎ 32

KOMUNA PARÎSÊ 36

ŞOREŞA RÛSYAYÊ - 1 39

ŞOREŞA RÛSYAYÊ – 2 42

TEVGERÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ 46

ŞOREŞÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ 48

BEŞA 3 53

DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC – 1 54

DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC – 2 58

DI DEMA ŞARISTANIYA KOLEDAR DE KURD 61

DI ŞARISTANIYA FEODAL DE KURD 64

DI ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE KURD – 1 67

DI ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE KURD – 2 69

ÇANDA BERXWEDAN Û XIYANETÊ 72

ÇANDA NETEWEYA DEMOKRATÎK – 1 76

ÇANDA NETEWEYA DEMOKRATÎK – 2 79

RÊGEZÊN NETEWEYA DEMOKRATÎK 82

BEŞA 4 87

TEVGERA ETNÎSÎTE Û NETEWEYA DEMOKRATÎK 88

ZÎNDÎBÛNA KEVNEŞOPIYA OLAN; TEVGERÊN OLÎ Û ÇANDÎ 90

TEVGERÊN XWESER ÊN BAJAR, NAVÇE Û HERÊMAN 93

ERKÊN REWŞENBÎRIYÊ 96

ERKÊN SINCÎ 100

ERKÊN POLÎTÎK 103

BEŞA 1

DI SERDEMA ŞARISTANIYA KAPÎTALÎst DE ÇAND Û SINC

1- ÇAND Û SINCÊ NETEWE-DEWLET Û TÊKÇÛNA SINC

2- ÇANDA NETEWEPERESTIYÊ

3- ÇANDA MALKIRINÊ(METAKIRINÊ)

4- ÇANDA EZEZÎ Û TÊKÇÛNA SINCÊ CIVAKÎ

5- ÇANDA POPULER

6- ÇANDA SEKS, HUNER Û WERZÎŞÊ

7- ÇANDA SANAL

8- ÇANDA MEDYAYÊ Û EMPERYALÎZMA ÇANDÎ

WANE 1

ÇAND Û SINCÊ NETEWE-DEWLET Û TÊKÇÛNA SINC

Dewleta neteweyî: Di nava wê de tenê neteweyek heye. Tevahî endamên neteweyê, li ser hîmê neteweperestiyê, xwe bi dewletê re yek dihesibînin. Weke ku dewlet û netewe, bibin yek. Ev şêweyê bingehîn ê dewleta şaristaniya kapîtalîst e. Di demên li dijî şoreşan, an jî demên şeran de dewleta netewe, dibe dewleta faşîst. Mirov nikare her duyan ji hev cuda bike.

Netewe-dewlet, an dewleta neteweyî di serdema nûjentiyê de pêş ketine û li gorî berjewendiyên xwe çandeke civakî afirandine. Li Ewrûpayê, ev pêvajo di sedsala 12'an de dest pê kiriye û piştî sedsala 16'an jî gihiştiye asta herî bilind, bi Peymana Vestfalya(**Westphalia-1648**) û pêkhatina pîşesaziyê re di sedsala 19'an de ev pêvajo sergihayî bûye. Di vê pêvajoyê de çanda netewe-dewletê hatiye çêkirin.

Peymana Vestfalya-1648

Ji beriya destpêkirina serdema kapîtalîzmê, mirov weke endamên malbat, ol, mezheb, an jî eşîran dihatin zanîn û naskirin. Li Kurdistanê, bi piranî hîn bi vî awayî ye. Dema kesek dixwest xwe bide naskirin, digot: "Ez ji Atînayê me, ji Romayê

me, xirîstiyan im, misilman im, elewî me, sunî me”. Yan jî eger girêdayî kîjan kanton, beg û eşîrê be; ew tanî zimên.

Netewe-dewlet, li cihê vê girêdanê; têgeha hemwaletiyê pêş dixe. Li gorî vê têgehê, hemwelatiyê her civakê û kesên ku di nava sînorên netewe-dewletê de jiyan dikin, ji aliyê hiqûqî û ramyariyê ve li pêşberî dewletê berpirsiyar in. Ji aliyê netewe-dewletê ve yek ramyarî, dîrok, al, ziman, çand û hwd. tên bicihanîn.

Amûra herî bibandor, di netewe-dewletê de neteweperestî ye û di asta oleke nû de ye. Neteweperestî, nirxekî pîroziyê dide dewleta neteweyî ku wê weke ‘Hebûna Xwedê ya li ser rûerdê’ bi nav dike. Yek ji erka ola nû ew e ku divê mirov bi dewletê ve bê girêdan û karibe xwe di riya wê de bide kuştin û vê jî weke nirxê herî bilind bipejirîne. Parastina netewe-dewletê jî, weke welatparêziyê û şert û mercên bingehîn ên xwedî sinc jî tê pejirandin.

Dewleta neteweyî, li aliyekî bi riya çand û baweriya xwe bi hemwelatiyên xwe ve stû dide tewandin. Li aliyê din jî, çanda civak û neteweyên din biçûk dibîne û bi hemwelatiyên xwe re dide pejirandin.

Koma serdest, weke tiştekî xwezayî û rewa tê naskirin. Lê komên çandî yên cuda jî hatine qedexekirin, an jî çewisandin. Mînakên vê yên herî balkêş li Tirkiyeyê tu astengî ji bo perwerdeya zimanê tirkî tune ye. Perwerdeya tirkî; bi wezaret, pergalên dibistan û amûrên weşanê tên bikaranîn. Lê li aliyê din, perwerdeya kurdî qedexe ye û tê pişaftin.

Ev pişaftin, ne tenê li ser kurdan tê birêvebirin. Ji ber vê pişaftinê, gelên ku îro li herêma Deryaya Reş jiyan dikin, tevî ku ne tirk in, weke tirkan tên dîtin.

Mînak: Pêvajoya pişaftinê ya li ser gelê Laz, ji sedî not û neh gihîştiye armanca xwe. Her wiha, li her gund, navçe û bajar liv û tevgerek heye. Bi taybetî jî, li gundên kurdên elewî mizgeft

tên çêkirin. Lê ta niha, yek gundê elewiyan, nikare ji bo xwe tenê maleke cemê (cihê perestinê yê elewiyan) veke.

Dibe ku çendek li hin deveran hatibin vekirin, lê ew herêm û cih hevkar an jî sîxurên dewletê ne. Di çanda dewleta neteweyî de tiştê ku jê re dibêjin hiqûq; li hemberî gel parastina dewletê ye.

Mînak: Di serhildanên li Kurdistanê de gelek caran ji aliyê hêzên netewe-dewletê ve li ser gel, bi taybetî zarokan bombe û gule tên barandin. Zarokên ku bizanabûn, an jî bêzanabûn; li gorî parastina rewa ya ku mafekî cîhanî ye, bersiva bombe û guleyên polîsan bi keviran didin, dema ku derdikevin pêşberî dadgehê bi dehê salan tên sezakirin û di heman demê de polîsên ku nûneriya dewletê dikin jî, bêtewan tên dîtin.

Di destpêkê de û piştre bi vî awayî pêşketina kapîtalîzmê, sincê civakî yê ku xwe dispart kevneşopiyan, parçe kiriye.

Ji beriya pêşketina kapîtalîzmê, sinc; di navbera ol, mezheb û komên li herêmekê jiyan dikin de risteke weke çîmentoyê dilîst. Lê, bi destpêkirina pêvajoya kapîtalîzmê re gav bi gav weke tiştekî paşketî tê dîtin. Li şûna girêdana sincî û wijdanê civakî; pîvanên hiqûqî yên ku li hemberî civakê parastina dewletê dikin, hatine bicihkirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Dewleta neteweyî, pênase bike.
2- Kengî û li ku derê, çanda netewe-dewletê hatiyê çêkirin?
3- Ji beriya destpêkirina serdema kapîtalîzmê, mirov çawa dihatin zanîn û naskirin?
4- Kîjan têgeh, bi awayê yekane ji aliyê netewe-dewletê ve tên bicihanîn?
5- Erka neteweperestiya ku di asta oleke nû de ye, diyar bike.
6- Komên çandî yên cuda, di nava dewleta neteweyî de çawa tên dîtin?
7- Armanca hiqûqê ya di çanda dewleta neteweyî de diyar bike.
8- Kapîtalîzm, li ser sincê civakî yê ku xwe dispart kevneşopiyan, risteke çawa lîstiye?

WANE 2

ÇANDA NETEWE PERESTIYÊ

Di pêvajoya şaristaniya kapîtalîst de teşeya dewletê ya ramyarî, bi piranî netewe-dewlet (dewleta ku li ser bingeha yek neteweyê tê avakirin) e.

Mînak: Dewletên weke; Tirkiye, Fransa, Elmanya, Îtalya, Îsraîl û hwd. bi vî awayî ne.

Di pergalên kapîtalîst de ku teşeya wan a ramyarî netewe-dewlet e, neteweperestî; amûra herî bingehîn a rêvebirinê ye û mirov dikare bêje; ola dewleta neteweyî ye.

Şaristaniya kapîtalîst, ji sedsala 19'an û pê ve neteweperestî, weke amûreke bibandor a bîrdoziyê bi kar aniye. Bingeha çanda neteweperestiyê, xwe dispêre serdema çêbûna eşîran. Her wiha, bi gelek gotinên weke; "yekîtiya neteweyî", "pêşketina neteweyî", "bazara neteweyî", "serbilindiya neteweyî" û hwd. re zanabûna neteweperestiyê di mejiyên mirovan de tê bicihkirin. Ev bangeşeya (propagandaya) neteweperestiyê; weke heyberên hişbir, li ser mirovan bandorê dikin. Kesên ku bi vê derûniyê; li netewe, ol û mezhebên cuda dinêrin, bawer dikin ku ji wan pêşketîtir û serbilindtir in. Ji ber vê yekê, dibin hişkbawer û êrîşkar.

Her wiha, cihê hişkbaweriya olî; hişkbaweriya neteweyî digire. Ango her ku diçe, têkilî û girêdanên olî tên paşdexistin û li şûna wan, ên neteweyî tên bicihkirin. Şerên berê yên ku bi navê pîroziya olî dihatin birêvebirin, cihên xwe ji şerên ji bo; "berjewendiyên neteweyî" û "pîroziyên neteweyî" re hiştine. Nîjadperestî, bîrdoziya fermî ya netewe dewletê ye. Neteweyên ku bi vê bîrdoziyê ve hatine birêvebirin, weke ku di sedsala 20'an de tê dîtin; ji her cure êrîşên şoven, nîjadperest û faşîst re bûne bingeha neteweperestiyê.

Her wiha, di encamê de ji bo netewe-dewlet û pergala kapîtalîst; civak û girseya herî stûxwehr hatiya afirandin.

Dewleta Faşîst

Kengî şêweyê dewleta neteweyî, ji hundir ve bi beşên civakê yên bindest û mêtî re û ji derve jî bi hêzên ku bi wan re di nava hevrikiyê de ne, dikeve şer; faşîzm vê qonaxê derdibire. Cudahiya di navbera wan de weke cudahiya di navbera pêvajoya şer û aştiyê de ye. Di her duyan de jî, pêkhatinên ramyarî yên cuda tên tunekirin.

Dewleta faşîst; civak û dewletê bi yekîtiyeke herî zêde derdibire. Yek; ziman, welat, çand, al û netewe dirûşmeya wê ya bingehîn e.

Tevahiya dîroka civakî çi qas çandên cuda yên ku komî ser hev bûne, çi etnîsîte, ziman, pêkhatinên ramyarî, hizir û bawerî hebin; hebûna hemûyan dikeve xeterî û bin gefan. Çi qas li ber xwe bidin û bi cudahiyên xwe ve bijîn, wê rûyê faşîst ê dewleta netewe derkeve holê. Pênc sed salên dawî, bi taybetî jî, sed salên wê yên ber bi roja me ya îro ve di asta kurewî(cîhanî) de rê li ber şerên neteweyî vekirine. Ev şer, ji tevahiya dîroka şaristaniyan zêdetir, bûn sedema; qirkirin, komkujî û xwînrijandinê. Ev yek, bi aweyekî eşkere û balkêş nîşan dide ku dewleta netewe û faşîzm, çavkaniya herî mezin a pirsgirêkan in.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Neteweperestiyê, pênase bike.
2- Navê çend dewletên, netewe-dewlet binivîse.
3- Çanda neteweperestiyê, xwe dispêre çi?
4- Bandora bangeşeya neteweperestiyê ya li ser mirovan çi ye?
5- Bîrdoziya fermî ya netewe-dewletê çi ye?
6- Dirûşmeya faşîzmê ya bingehîn, çi ye?
7- Çend taybetmendiyên dewleta faşîst, diyar bike.

WANE 3

ÇANDA MALKIRINÊ

Her tiştê ku em karibin di nava çarçoveya çandê de bidin nasîn, di serdema şaristaniya kapîtalîst de hatiye malkirin (sermiyankirin). Berhemên ku ji bo firotinê (bazarê) hatine amadekirin, weke mal(sermiyan) tê danasîn.

Bikaranîna mal, ne ji aliyê şaristaniya kapîtalîst ve hatiye afirandin; di serdemên ji beriya kapîtalîzmê de mal (pere û berhemên ku ji bo bazarê hatine amadekirin) dihat bikaranîn. Ango mirovan fêkî û dexlên ji zeviyên xwe yên ku ji xwarina wan zêdetir in, dibirin bazarê; yan rasterast bi pêdiviyên xwe re diguhertin, an jî bi pereyan difirotin.

Mînak: Genim, hirî û hêk ji gundê xwe tanîn û bi pêlav, cil û heyberên tîmarê re diguhertin. An jî eger pêwîstiya wan bi tiştan nebûna, bi pereyan difirotin.

Pere, di wateya her tiştî de bû, kengî bixwestana pêwîstiya xwe ji bazarê yan jî ji cihekî din wê bikirîna. Ji ber vê yekê, pereyan jî li ser vê bingehê di destpêka xwe de di astekê de karê mirovan hêsan dikir. Ango ne pere, ne jî mal; ji aliyê şaristaniya kapîtalîst ve hatiye afirandin.

Me di mijarên xwe yên beriya vê de jî dîtibû ku çand, her tiştê ku mirov afirandiye. Dema ku mirov ji aliyê biyolojîk û hizirî ve ji zindiyên din cuda bû, derbasî jiyana civakî bû. Di heman demê de em dizanin ku çand bi xwe, weke; çanda daringî

û çanda rewanî dabeşî du cureyan dibe. Her çi qas di navbera van de têkiliyeke girîng hebe jî, xweseriyên her duyan jî heye.

Mînak: Nayê hizirîn ku kesek nirxên xwe yên sincî, bi pereyan bifiroşe.

Her wiha, helwest, bîrdozî, têkoşîn û hwd. weke berhemên çanda rewanî hatine dîtin. Kesek welatparêz, an jî şoreşger; li pêşberî pereyan van napejirîne.

Lê, di serdema kapîtalîzmê de ev hevsengî di navbera çanda daringî û rewanî de kêlî bi kêlî tê rakirin û dibe ku her nirxê sincî û civakî bibe mijara malkirinê. Tê zanîn ku piştî destpêkirina şaristaniya serdestiya zilam(baviksalarî), jin gav bi gav ji nava jiyana civakî hatiye qewitandin û li malê hatiye kolekirin. Lê, bi destpêkirina pêvajoya kapîtalîzmê re bi hêz û hewldanên zilam ên qaşo nûjenkirinê, jin ji malê hatiye derxistin û li bazaran hatiye pêşkêşkirin. Dibe ku weke serdemên koledariyê li bazaran nayê firotin, lê ji neynûkê bigire ta porê wê, ji ken bigire ta giriyê wê, di reklaman de hatiye pêşkêşkirin. Dema ku em bihizirin, îro li cîhanê ji bo qezenckirina pereyan a girîng, reklam in. Ev jî yek ji encama kapîtalîzmê ye.

Ol jî, ji aliyê her pergala desthilatdar ve hatiye bikaranîn. Di serdema koledariyê de serdestan bi vê hêzê, xwe weke; xweda-qral dîtine. Piştre, bi taybetî li Rojhilat, împaratoran xwe weke xelîfeyê xweda dîtine. Lê, di serdema kapîtalîzmê de bi awayekî cuda bûye. Li şûna ku xwe weke xweda, an jî weke xelîfe bibînin; pere derbasî şûna her tiştî kirine. Jin, zilam, an jî

taybetmendiyeke wan a zayendî, evîn, şeref, namûs, ol, sinc, huner, wêje û hwd. çi qas di bin xizmeta wan de ji bo qezenckirina pereyan bin, ew qasî baş û girîng in. Ango di hizira olî de nirx û cihê xweda çi qasî giranbuha ye; di kapîtalîzmê de jî li şûna wê, pere bi cih kirine. Çawa ku li gorî oldarek nirxê herî pîroz, giranbuha û dest jê nayê berdan; xweda be, di çanda kapîtalîzmê de jî her tişt; pere ye. Kes, civak, xweza, dar û daristan, erd, asîman, heyv, roj û gerdûn; pêwîst e li ber xwedayê(pere) şaristaniya kapîtalîst stûyê xwe bitewînin.



Gerestêrka Behramê

Mînak: Ne ji ber evîna zanist û lêkolînan e ku ji aliyê dewletên emperyalîst ve projeyên balafir û lêkolînên fezayê tên pêşxistin. Li gorî agahiyên ji aliyê NASA'yê ve di deh salên pêşiya me de navenda çavdêriyên lêkolînê, wê li ser gerestêrka Behramê(Mars) dest bi lêkolînan bike. Ji ber ku armanca wê, bidestxistina heyînên ku li ser rûyê erdê kêm tên dîtîn ên weke; zêr, ûranyûm û hwd. Dema ku em bihizirin, tê dîtin ku jiyana civakî û xwezayî ya li ser rûye cîhanê, ji aliyê wan ve tê tunekirin û windakirin. Ji ber ku armanca wan a derdikeve pêş, pere ne.

Pergala kapîtalîzmê, hêza pereyan li cihê xweda bi cih kiriye. Ango bendekeya Xweda=Pere herî zêde ji bo civaka kapîtalîst derbasdar e.

Pere, berdevkê bingehîn ê giyana pergala kapîtalîzmê ye. Hêzeke bisehr e, tu tiştê ku pê neyê vekirin, tune ye. Civakê, ji beriya vê bi gelek hêzan baweriya xwe aniye û pê bawer kiriye,

weke; totem, xweda, xweda-qral û hwd. Lê, di serdema kapîtalîzmê de nirxê ku di oxira wê de her tişt tê girtina li ber çavan; bi şerên tunebûna civakan encamdar dibin. Tişta ku giyana her kes û civakê dagir kiriye; pere ye. Di pergala kapîtalîzmê de bûye nasnameya mirovkuj(canî) a herî derbasdar.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Bikaranîna mal(sermiyan) ji kîjan serdemê ve hatiye afirandin û çawa dihat bikaranîn?
2- Bandora serdema kapîtalîzmê ya li ser çand û sincê civakê, diyar bike.
3- Di destpêkirina şaristaniya serdestiya zilam de jin çawa dihat dîtin?
4- Di serdema koledariyê de serdestan xwe weke çi didîtin?
5- Armanca dewletên emperyalîst a ji projeyên balafir û lêkolîna fezayê ya li gorî NASA'yê, diyar bike.
6- Rewşa jinê ya bi destpêkirina pêvajoya kapîtalîzmê re diyar bike.
7- Pergala kapîtalîst, hêza pereyan çawa dinirxîne?

WANE 4

ÇANDA EZEZÎ Û TÊKÇÛNA SINCÊ CIVAKÎ

Ezeziya ku parastina berjewendiyên kesî û paşguhkirina yên giştî dike, bi destpêkirina serdema kapîtalîzmê re pêş ketiye. Ji berjewendiyên xwe zêdetir, tu tiştekî nas nake. Bingeha kesek ezezî, tenê ji berjewendiya kesî ya pîroz pêk tê û tenê dikare ji bo vê bikeve liv û tevgerê.

Teşeya civakî ya çandî ya ku sermiyandar li ser civakê disepîne, ezezî ye.

Ezezî, nasnameya kapîtalîzmê ya bingehîn e. Ezezî, têkilî û girêdanên civakî yên ku bi sedê salan tên pêkanîn, wan hêdî hêdî ber bi tunebûnê ve dibe û çêkera sincî pir lewaz dike. Mirovê ezezî pê re heye, ne endamê bisûd ê civakê ye; hebûn û berjewendiyên xwe, di ser hebûn û berjewendiyên civakê re digire.

Ev kesayeta mirovên ezezî, di her têkiliya xwe de berjewendiya xwe bingeh digire û her tim di mijara kirîn û fîrotinê de dihizire. Eger têra xwe tê de berjewendî, yan jî pere bibîne; ne hevaltî, bira, dayîk û bav, ne jî bîrdozî û baweriyê nas dike. Nayê kar û xebata hevbeş a civakî û ji ber ku her tim bi berjewendiya xwe dihizire, di têkiliyên bi kesan re êrîşkar e.

Mirovahiyê bi sed hezarê salan bi riya civakibûna xwe, kariye hebûna xwe bidomîne. Ji ber vê yekê, rêbaza herî baş a fêrbûn û fêrgeha mirovan, civak e. Mirov, ji civakê fêr dibe û tiştê ku fêr bûye, dubare li civakê vedigerîne. Lê kesayetiya ezezî, her tiştî ji civakê digire, fêr dibe û dubare li civakê venagerîne; ji ber ku vê ji xwe re weke kêmasî û şermekê dibîne. Di têgihîştina vê kesayetiyê de ji bo nirxên civakê, bi qasî pirtikekê jî nêzîkatiyeke bi hestyarî tune ye. Hema bêje hemû têkiliyên xwe, bi berjewendiyên xwe ve girê dide.

Ev rastî, tê wateya têkçûn û parçekirina sincê ku tevna bingehîn a civakîbûnê pêk tîne. Mîrova/ê ku her tim bi berjewendiya xwe dihizire, pirî caran li kesek din nahizire. Ji ber vê yekê, li gorî kesek ezezî; mirovek hebe, yan jî nebe ew e. Lê bi qasî berjewendiya xwe, bi mirovan re têkiliyan çêdike û nêzîkî wan dibe. Di encama vê nêzîkbûnê de baweriya endamên civakê ya ji hev re namîne. Her wiha, di têkiliyên civakî de têkiliyên erênî yên ku civakê ava dikin, tên xerabkirin û di nava civakê de pêş dikevin. Di nava civakê de têkiliyên bingehîn ên mirovbûnê, yên weke; hevkariya hevbeş û parvekirina bi hev re weke têkiliyên bêwate û vala tên dîtin.

Tê zanîn ku têkiliya herî rast a di civakê de her tim xwe ji têkiliyên nebaş rizgar kirin e. Tê wateya ku rewşa mirov û civaka li derdora mirova/ê ezezî re ne xem e.

Her wiha, ev çanda ezeziyê, civakê ji aliyê sincî ve ber bi xerabûnê ve dibe. Ji ber ku mirovên ezezî, têkiliyên civakî lewaz dikin û nirxên sincî ji holê radikin. Ev çanda ezeziyê, weke kurmê darê yê ku civakê dirizîne ye.

Di civaka roja me ya îro de çanda ezeziyê, bi bandora xwe her awayî ya li ser jiyanê, weke penceşêrê ketiye nava civakê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Bingeha mirovên ezezî, çi ye?
2- Bandora ezeziyê ya li ser têkilî û girêdanên civakî çi ye?
3- Çend taybetmendiyên mirovên ezezî binivîse.
4- Rêbaza herî baş a fêrbûn û fêrgeha mirovan, çi ye?
5- Kengî mirovên ezezî bi mirovan re têkiliyan çêdikin û nêzîkî wan dibin?
6- Bandora têkiliyên rast a di civakê de li ser mirovên ezezî, çi ye?

WANE 5

ÇANDA POPULER

Peyva populer, weke peyvekê tê wateya “gel” an jî, tiştê têkildarî gel e. Lê pergala kapîtalîzmê ya dagirker û kedxwar, her tişt li gorî berjewendiyên xwe guhertiye, ji nû ve watedar kiriye û ji rê derxistiye.

Çanda populer a ku bi riya kapîtalîzmê hatiye çêkirin, weke çandeke ku tê wateya peydakirina pêdiviyên rojane û mezaxtina nirxên daringî û rewanî yên mirovan.

Ji modeyê bigire ta xwarin û vexwarinê, ji markeyê bigire ta muzîka pop, kovar, bername û rêzefîlmên TV, di çarçoveya çanda populer de hatine bicihkirin. Ev; li TV, yan jî li her qada civakî (navenda çand û huner, xwaringeh, sînema, pêşengeh û hwd.) bi awayekî herî baş û balkêş ji gel re tên pêşkêşkirin.

Mînak: Markeya kola ya ku em pir nas dikin û bi kar tînin, her wiha çerezên ku bi her awayê ambelajan tên firotin, eger werin lêkolînkirin, wê were dîtin ku nirxê heybera ku ji bo ambelajan tên bikaranîn, ji tîştên di nav de zêdetir e. Di encamê de heyberên ambelajan ên ku ji bo çerezan (şekirok, çikolata, patatokên ji bo zarokan û hwd.) tên bikaranîn, tenê hêza firotinê zêde dike.

Mirov ji roja xwe ya destpêkê ve dema ku civakîbûn dest pê kiriye û pê de hem ji bo ku karibe xwe li ber şert û mercên xwezayê ragire, hem jî ji ber hesta xwe ya sincî, pêwîstî bi cilûberg li ber xwe kirinê, dîtiye. Lê, ji ber têgeha çanda populer a kapîtalîzmê, bi taybetî di civakên kapîtalîst de kesek newêre cileke kevn li ber xwe bike û bi kar bîne. Ev rastî, ne ji bo çend

cil û şekirok, an jî cureyên vexwarinan derbasdar e, yan jî dema kesek diçe bazarê; pênûsekê, yan jî komputerekê bikire, di kurahiyên hucreyên mejî de navê wan tiştan ên ku ji derdorê bihîstiye, yan jî di TV de reklama wê temaşe kiriye, dikire. Sedema vê, çanda populer e.

Ji dûr ve agahiyên herî kêm, bi riya amûrên ragihandinê yên weke; TV, radyo û hwd. ji aliyê mirov ve tên pêkanîn. Ev amûr, ne berhemên pergala kapîtalîzmê ne (berhemên mirovan in) û ne heyberên biziyan in jî. Lê, bi riya çanda populer her yek ji van, bûye bazareke mezin a pergala kapîtalîzmê. Rastî ev e; di aliyê firotinê de ji bo sûda zêde, pergala kapîtalîzmê kêlî bi kêlî teşe û markeya amûran diguhere.

Di heman demê de ji ber ku zanist jî di bin xizmetê de ye, ne tenê guhartina marke, yan jî teşe ye, lê belê bikaranîn û asta kêrhatina wan amûran jî li berçavan tê girtin.

Mînak: Ji du telefonên ku ji heman markayê ne, ya herî zêde reklama wê tê kirin û bi nav û deng e, zêdetir tê firotin. Di vî karî de tu carî rewş û pêdiviyên civakê nayên hizirîn û li berçavan nayê girtin.

Mînak: TV yên rengîn piştî demeke kurt, ji yên reş û spî tên çêkirin. Lê, ji ber ku ta wê demê pir zêde TV yên reş û spî hatine hilberîn, eger yên rengîn bikevin bazarê, ev yek wê bibûna sedema têkçûna xwediyê şirketên TV yên reş û spî. Ji ber vê yekê, demeke dirêj hemû cîhanê li TV yên reş û spî temaşe kiriye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Peyva populer, pênase bike.
2- Çanda populer a ku bi riya kapîtalîzmê hatiye çêkirin, tê çi wateyê?
3- Têgehên çanda populer di qadên civakî de bi çi awayî ji gel re tên pêşkêşkirin?
4- Bandora ambelaja heyberên çerezan a di pergala kapîtalîzmê de çi ye?
5- Çima pergala kapîtalîzmê kêlî bi kêlî teşe û markeya amûran diguhere?

WANE 6

ÇANDA SEKS, HUNER Û WERZÎŞÊ

Pergala desthilatdar a kapîtalîzmê, ji bo ku karibe koledariya xwe bi civakê re weke tiştekî xwezayî bide pejirandin û di jiyana civakî de mayînde bike, ev her sê têkiliyên (seks, huner û werzîş) girîng ên mirovan, di mejiyê mirovan de kêlî bi kêlî, dide jiyankirin û weke tiştên kirîn û firotinê lê dike.

Qadên sereke yên ku serdestên kapîtalîzmê bi kar tînin, ev qad in. Di nava her sê têkiliyan de jî, qada seksê ye. Li aliyekî taybetmendî û têkiliyên seksî tên malkirin û weke amûrekê li bazarê tên bikaranîn û li aliyê din jî ji bo hilweşandina civakê bi awayekî bibandor tên bikaranîn.

Ji bo vê çandê, rista herî mezin a ku jê re tê dayîn, jin e. Jin, bi her taybetmendiya xwe ve weke amûreke seksê tê bikaranîn. Ji bo ku ev ji aliyê civakê bi taybetî, ji aliyê jinê ve were pejirandin, di her şert û mercê de diyardeya seksê, yan jî lixwekirina cilûbergên seksî ku bala her kesî dikişîne li ser xwe, weke rêgezeke nûjeniyê tê nîşankirin.

Hemû hestên pîroz, ên weke; evîn, rêzgirtin, rûmet û hezkirin her tim û li her deverê tên bicihanîn. Lê belê, têkiliya seksî ya ku ji bo mirovan pir xwezayî ye, hem dikeve bin xizmeta têkiliyên li ser bingeha berjewendiyên piralî, hem jî dikeve bin xizmeta têkiliyên desthilatdariyê yên ku zilam bi riya seksê zilamtiya xwe eşkere dike. Di encamê de hemû endamên civakê yên ji nifşên cuda (zarok, ciwan, zilam), dikevin bin bandora vê çandê. Ji ber vê yekê, bi hêsanî ji hest û hizirên pîroz qut dibin. Ev jî, rêgeza bingehîn a desthilatdariya kapîtalîzmê ye. Di vî warî de polîtîkaya ku li qada seksê tê birêvebirin, li qadên huner û werzîşê jî, bi heman awayî tê birêvebirin. Bi rastî jî huner; hem di civakê de xwedî risteke diyarker e, hem jî hêza

afirîner û têgeha mirov a xweşikbûnê(estetîkê) ye. Lê di pergala kapîtalîzmê de qada hunerê, weke qadeke kar û fêdeyê tê bikaranîn û dikeve warê qezenckirina pereyan. Ji ber ku pergala kapîtalîzmê, di mijarên xwe de her tim tiştên aşopî, nerast û seksûel (taybetmendiyên seksî) digire dest, hem dibe sedem ku civak pê bitevize, bi barê giran ê kedxwarî û dagirkeriyê hayedar nebe, hem jî dibe sedem ku huner ji armanca xwe dûr bikeve. Di qada werzîşê de jî, heman tişt tê pêkanîn.

Pergala kapîtalîzmê, werzîş ji bingeh û koka wê dûr xistiye û di nava pergalê de kiriye karekî taybet. Li şûna ku li ser bingeha moralên bilind û hêza fîzîkî bibe warê beşdarbûna civakê, bûye qada qezenckirina pereyan, nirxên sincî yên mirovan xerab kiriye û civak bûye temaşevanê neyîniyê.

Mînak: Di çanda gladyatorê de mirov weke pariyeke şêrîn avêtine ber devê şêran, bi neçarî û zorê wisa kirine ku lîstikvan hev du bikujin. Hema bêje hemû cureyên werzîşê, bi vî awayî tên xuyakirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çawa pergala kapîtalîzmê, dikare koledariya xwe bi civakê bide pejirandin?
2- Çima serdestên kapîtalîzmê, qada seksê di civakê de dike mal(sermiyan)?
3- Dema ku endamên civakê dikevin bin bandora seksê, çi encam derdikeve holê?
4- Di pergala kapîtalîzmê de qada hunerê, weke kîjan qadê tê bikaranîn?
5- Çima pergala kapîtalîzmê her tim tiştên aşopî, nerast û seksûel di civakê de digire dest?
6- Pergala kapîtalîzmê, di qada werzîşê de bandoreke çawa kiriye?

WANE 7

ÇANDA SANAL

Peyva sanal, weke peyv tê wateya; kopya, yan jî dîmena rastiyê. Ango ew tişt bi xwe tune ye, lê texmînî û farazî weke heye tê pejirandin. Çanda sanal, weke têkilî; kar û xebata jiyanê ya ku xwe dispêre kopya, yan jî dîmena rastiyê ye.

Di serdema me de di pêşketina zanistê de berhemên cur bi cur ên teknolojiyê, bi awayekî bilez hatine afirandin. Vê pêşketinê, di heman demê de bi xwe re çanda sanal jî pêş xistiye. Ji ber ku nûjentiya kapîtalîst, zanist û teknolojiya xistine bin xizmeta xwe û bi awayekî pir xerab bi kar anîne, pêşketina çanda sanal bi leztir bûye.

Temaşekirina TV ya pir zêde, mijûlbûna li ser înternetê û bikaranîna komputerê ya pir zêde li qadên cuda yên jiyanê, mirovan ji rastiya jiyanê qut dike. Ji ber ku tiştên di van amûran de tên temaşekirin, ne rastî bi xwe ye, xuyanga rastiyê ye. Di encamê de cîhana ku kes pê re rû bi rû dimîne; ne ya rastî, ya sanal e.

Kapîtalîzm, ji her pêşketina zanist û teknolojiyê sûdê werdigire. Bi pêşketina înternetê re cîhana sanal di astekê de herî jor de ye. Înternet jî, weke hemû teknolojiyan, ketiye bin xizmeta sermiyandaran. Ji reklaman bigire ta bi hezarê malperan, weke tiştên ku li bazarê tên pêşkêşkirin. Çanda sanal, di wê astê de pêşketî ye ku li piraniya welatan ji bo kirîna tiştekî, çûna bazaran ne pêwîst e. Ji ber ku mirov dikare tenê bikeve malpera ku ew tişt lê tê firotin û hejmara xwe ya bankayê, yan jî ji pereyên xwe yên li bankayê, bi qasî ku tê xwestin razîne li

ser hejmara wê malperê. Dibe ku ev, ji bo me weke hêsanbûna jiyanê be.

Ji aliyekî ve rast e, lê li aliyê din jî ne wisa ye. Ji ber ku ji civakîbûn û têkiliyên civakî dûrketin heye. Tê zanîn ku nifşê ciwanan, ji qadên ku ji xwe re bazirganî û tiştên neyînî û nebaş ên cuda dikin armanc, bi taybetî bernameyên qadên sanal pêş dixin û dixin pratîkê. Her wiha, bi fîlmên cur bi cur ên li ser zanist û teknolojiyê, fîlmên anîmasyon(filmên karton) û lîstokên atarî, li ser mejiyên zarokan desthilatdariya cîhana sanal disepînin; hîn di temenê biçûk de ew jî tên kişandina nava çanda sanal.

Di avakirin û mezinbûna civakê de cîhana zarokan, risteke bingehîn dilîze. Lê bi vî awayî, sanalkirina cîhana zarokan, pêşeroja civakê dixe metirsiyê û bijehr dike. Ji ber ku zarokên bi vî awayî mezin dibin, ji pirsgirêk û têkiliyên civakî dûr dikevin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Sanal çi ye? Pênase bike.
2- Çima di nûjentiya kapîtalîst de pêşketina çanda sanal, bi leztir bûye?
3- Çawa mirov ji rastiya jiyanê qut dibe?
4- Çima di jiyana sanal de ji bo kirîna tiştêkî, çûna bazarê pêwîst nake?
5- Çawa li ser mejiyên zarokan, desthilatdariya cîhana sanal disepînin?
6- Çima bi sanalkirina cîhana zarokan, pêşeroja civakê dikeve metirsiyê?

WANE 8

ÇANDA MEDYAYÊ Û EMPERYALÎZMA ÇANDÎ

Hemû amûrên ragihandinê; TV, radyo, înternet û çapemenî bi hev re weke medya tên binavkirin. Medya, di roja me ya îro de ji bo belavbûna çandê (çanda erênî, yan jî neyînî) ya li qada neteweyî û navneteweyî, xwedî risteke bandorker e. Îro jî medya bi taybetî, yekdestên medyayê yên ku di bin xizmeta pergalê de ne, ji bo karibin çanda kapîtalîzmê ragihînin civakê, yan jî ji bo karibin desthilatdariya pergalê pêş bixin, risteke sereke dilîzin.

Erka vê medyayê, ne tenê ragihandina çanda kapîtalîzmê ya sereke ye. Lê belê, hilberîn û belavkirina wê ye. Di roja me ya îro de mirovahî hema bêje her tiştê ku li cîhanê pêk tê, bi riya medyayê fêr dibe. Di serî de TV û bi riya hemû amûrên din ên ragihandinê yên ku wêneyeke cuda û diyar didin jiyanê.

Di jiyana mirovahiya îro de televîzyon cihekî girîng digire. Ji ber vê yekê, dema ku em televîzyonê weke mînakekê bigirin dest, xuya ye ku amûra herî zêde lê tê temaşekirin, televîzyon e. Her wiha, çanda kapîtalîzmê, herî zêde ji aliyê televîzyonê ve tê ragihandin.

Bi riya nûçeyan, an jî bi bernameyên çandî yên cuda; bi awayekî rojane û kêlî bi kêlî civakê bi ramanên bîrdozî ve bandor dike.

Em ê çawa bihizirin, kîjan cilûbergan li ber xwe bikin, bi çi awayî tiştan bikirin û bimezixînin, çawa biaxivin, li ser çi bihizirin û jiyaneke çawa bipejirînin? Ev hemû, bi riya televîzyonê bi me didin pejirandin.

Di civakê de bikaranîna filmên xwedî taybetmendiyên seksî û tundiyê pir zêde ne û her ku diçe, her kes li heman muzîkê guhdar dike, heman filmî temaşe dike, heman tiştî aşopî dike û li pêşberî heman tiştî hestiyar dibe û heman kesayetiyê diecibîne.

Medya, amûra herî bibandor a mejî û dilê nûjentiyê ye. Netewe-dewlet, ji derfetên ku teknolojiya ragihandinê diafirîne, sûdeke mezin werdigire. Bi karanîna van amûran re ji xwe re hemwelatiyan çêdike û çanda seks, werzîş û hunerê giştî dike û naveroka wan vala dike. Her wiha, dema ku wan pêşkeş dike, girseyê weke nezan, an jî weke keriyekî pêz dibîne. Bi vî awayî, medya; rista sereke dilîze.

Welatên ku medyayê bi rê ve dibin û li tevahiya cîhanê bibandor in, bi taybetî jî welatên Ewrûpa û Emerîka; rêbazeke girîng a ku afirandine û pêş xistine, emperyalîzma çandî ye. Emperyalîzma çandî, bi vî awayî tê danasîn; pejirandina nirxên çandî û bîrdoziya welat, an jî dewletekê bi gelên welatên cuda re **emperyalîzma çandî** tê gotin.

Bi pêşketina amûrên ragihandinê ya li tevahiya cîhanê, ev derfet ketiye destê hemû netewe-dewletan. Lê di rastiyê de ji vê hêza medyayê, dewletên ku hêza medyayê di asteke herî zêde de di bin çavdêriya xwe de digirin, sûd wergirtine. Bi riya medyayê, pergala ragihandinê ya li cîhanê kêlî bi kêlî dişopîne û di bin çavdêriya xwe de digire.

Ji bo ku hemû gelên cîhanê, weke Ewrûpa û Emerîka jiyan bikin û şêweyê jiyana wan bipejirînin, hewldaneke bêhempa tê birêvebirin. Ev berfirehî û belavbûna çandî, herî zêde jî bi navê rojavabûnê li pêşberî gelên din ên cîhanê, weke pêşketîbûna vê

çandê tê nîşandan. Ev yek jî ji bo emperyalîzma çandî, bûye palpişteke pir girîng.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Erka medyayê ya di pergala kapîtalîzmê de diyar bike.
2- Çima çanda kapîtalîzmê herî zêde ji aliyê televîzyonê ve tê ragihandin?
3- Bi çi awayî televîzyon, civakê bi ramanên bîrdoziyê re bandor dike?
4- Çawa netewe-dewlet, di teknolojiya ragihandinê de risteke sereke ya xerab dilîze?
5- Emperyalîzma çandî, pênase bike.
6- Bi riya çi, pergala ragihandinê ya li cîhanê kêlî bi kêlî tê şopandin?

BEŞA 2

DI DEMA ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE BERXWEDANA ÇANDÊN CEWHERA KOMÎNAL

1- SOSYALÎZMA ZANISTÎ

2- KOMUNA PARÎSÊ

3- ŞOREŞA RÛSYA - 1

4- ŞOREŞA RÛSYA - 2

5- TEVGERÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ

6- ŞOREŞÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ

WANE 1

SOSYALÎZMA ZANISTÎ

Tê zanîn ku di dîrokê de û bi hezarê salan B.Z. bi giştî du şaristanî derketine holê. Yek jê; şaristaniya demokratîk a ku piştgiriya xwe ji polîtîka û sincê civaka xwezayî digire û ya din jî; ya ku weke şaristaniya desthilatdar a navendî tê binavkirin e.

Ev her du şaristanî ku li ser bingeha dijberiya hev du ya ku di hemû pêvajoyên dîroka pergalên dewletî yên hiyerarşî de hebûna xwe domandine.

Ji aliyekî ve ya yekê; nûneriya hevparî, beşdarî, piştgirî, civakîbûn û hwd. bi kurtasî nûneriya polîtîka û sincê civakê tê kirin; ji aliyê din ve jî, nûneriya ezezî, desthilatdarî, çînayetî û hwd. tê kirin. Ev her du pergal, di çêkera hişmendiyê de her tim di nava têkoşînê de bûne. Ji vê pergala ku bi hezarê salan di nava têkoşînekê de û nûneriya pergala şaristaniya demokratîk dike re **nûjentiya demokratîk** tê gotin û ya ku nûneriya pergala şaristaniya navendî ya çar sed salên dawiyê dike re jî, **nûjentiya kapîtalîzmê** tê gotin.

Ev çêkera dualî diyar dike; li cihê ku serwerî, zext, zorî, kolekirin û hwd. tê de hene, bi misogerî li dijberî vê bi daxwazên; azadî, dadgerî û demokrasiyê û hwd. jî wê sekneke berxwedêr hebe. Ji ber vê yekê, li hemberî vê pergala desthilatdar a di şert û mercên kapîtalîzmê de ya ku dijî wê derketiye û herî bibandor, sosyalîzma zanistî ye.

Di modela sosyalîzma zanistî, di nava civakê de zordestî û xerabkirina xwezayê tune ye, hevsengiya aborî û plansaziya niştecihî bi rêk û pêk e. Sedema derketina sosyalîzma zanistî; tevgerên şoreşgerî yên ku li hemberî kapîtalîzma dewletê ya ku li ser yekdestiya aboriyê xwe bi rê ve dibe, derketiye. Ev pergal, ji aliyê civaknas Marks û Engels ve hatiye afirandin.

Ji ber vê yekê, ev pergal dikare weke sosyalîzma Marksîzmê jî were danasîn.

Thomas Moore

Marks û Engels, ji bo ku cudabûna xwe nîşan bidin, ji nêzîkatiyên xwe yên sosyalîst re gotine; sosyalîzma zanistî, lê ji yên beriya xwe yên weke; Thomas Moore, Robert Owen, Saint Simon, Fourier û hwd. re civaknasên weke sosyalîstên aşopî bi nav kirine. Ji ber ku ev civaknas, dixwazin bi awayekî îdeal (Civakeke ku berjewendiyên mirovên kapîtalîst û çîna karkeran bi hev re bijîn û ji hev bawer bikin) ku neyê bicihkirin, civakeke dilxweşî li ser bingeha sosyalîzmê ku hemû hilberîn û berhem werin belavkirin.

Marksîzma ku weke sosyalîzma zanistî tê naskirin, bi rastî jî xwestiye zanistî bibe. Ta di vê mijarê de xwe weke 'zanista zanistan' dide nasîn. Lê mixabin, zanista ku piştgiriya xwe jê digire, zanista dema wî ye. Ji ber ku di pêvajoya niha de hatiye têgihîştin, gelek kêmasiyên wê hene û ji gelek rastiyan dûr e. Zanista civakî ya demê, ji çavkaniya pirtûka **Morgan** a bi navê 'civaka kevn' tê û di vê pirtûkê de zanîna dîrokî bi Grek re sînordar e û hîn dîroka Mezopotamya û ya kevntir nayê zanîn. Di mijarên bikaranîna xwezayê de yên ku tên zanîn, encamên ku Darwîn derxistine holê û bi fîzîka Newton a klasîk ku ji gelek zanistan re bûye pîvan, sînordar e.

Lewis Henry Morgan

Çavkaniyên ku Marksîzm piştgiriya xwe jê digire:

Ew jî weke yên beriya xwe, piştgiriya xwe ji nirxên komînal ên demokratîk, ango pergala şaristaniya demokratîk digire. Weke ku ew jî eşkere dikin, ji sê çavkaniyan tîmar bûne. Ew jî, ev in:

Sosyalîzma aşopî ya Fransa (nêrîna têkoşîna çînî), Felsefeya Elman (materyalîzma diyalektîk), Aborî-Polîtîkaya Îngilîz (nêrîna nirx).

Têkoşînên Marks û Engels

Karl Marks (1818–1883): Li bajarê Trierê yê Elmanyayê ji dayîk bûye. Bavê wî parêzerekî cihû ye. Bavê wî di sala 1824'an de protestanî pejirandiye.

Friedrich Engels (1820-1895): Li bajarê Barmen (Wuppertal) yê Elmanyayê ji dayîk bûye. Kurê pîşesazekî ye.

Karl Marks Friedrich Engels

Marks û Engels, weke pêşengên bindestan hatine binavkirin. Pêşengên sosyalîzmê û tevgerên komunîst ên qada navneteweyî ne. Ji ber bandor û zanista wan, weke marksîzmê tê bibîranîn.

Di Îlona 1844'an de Marks û Engels, hev nas kirine. Bi têkoşîna proleterya ya pir mezin, pêşengiya teoriya şoreşê kirine û taktîkên wê pêş xistine. Di destpêka havîna 1847'an de Marks û Engels, tevlî komeleya veşartî ya bi navê Yekîtiya Komunîst dibin.

Di kongreya duyem a Mijdara 1847'an de risteke girîng dilîzin. Li ser xwesteka kongreyê, di Sibata 1848'an de Manîfestoya Komunîst dinivîsin.

Piştî sala 1850 dikevin qada pratîkî. Di nava rêxistinên ku hemû bindestan rizgar bikin de cih digirin. Ew rêvebirên bingehîn ên **Yekîtiya Karkeran a Navneteweyî** ya ku di 28'ê Îlona 1864'an de li Londonê hatiye sazkirin. Ji ber vê yekê, çîna afirêner a şoreşa proleterên cîhanê ne, dixebitin û pergalên wan ava dikin û pergala xwe jî didin sazkirin.

Hemû jiyana xwe, gorî rizgariya bindestan kirine. Hem teorî, hem jî pratîkî ketine nava ked û hewldaneke pir mezin.

Jixwe, ji ber vê sekna wan, hemû têkoşînên civakî yên di sedsala 19. û 20’an de bi navê marksîzmê têkoşîna xwe meşandine.

Bi taybetî, Marks di vê jiyana xwe ya şoreşgerî de hem ji aliyê aborî, hem jî ji aliyê ramyarî ve gelek zehmetî jiyan kirine. Ji ber sekna xwe ya dijber, surgûnî gelek bajarên Ewrûpayê dibe û êdî cih namîne ku lê were surgûnkirin. Beramberî zehmetiyên aborî, zarokên wî ji ber nexweşiyan jiyana xwe ji dest didin, tenduristiya wî xerab dibe. Zêdetir bi alîkariya Engels jiyana xwe didomîne. Tevî ku pir têkoşîn kirine, cîhaneke ku hemû bindest azad bibin, çînayetî rabe û wekhevî were avakirin, bi dest nexistine. Xwe ji pergala kapîtalîzmê ya ku li dijî wê ne, rizgar nekirine.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di dîrokê de B.Z. çend şaristanî derketine holê û kîjan in?
2- Sosyalîzma zanistî, pênase bike û sedema derketina wê diyar bike.
3- Navê çend civaknasên ku weke ‘sosyalîstên aşopî’ hatine binavkirin, binivîse.
4- Çima marksîzma ku xwe weke zanista zanistan dide nasîn, gelek kêmasiyên wê hene û ji gelek rastiyan dûr e?
5- Çavkaniyên ku marksîzm piştgiriya xwe jê digire, diyar bike.
6- Marks û Engels, bi çi awayî hatine binavkirin û çima?
7- Çend têkoşînên Marks û Engels, diyar bike.
8- Çima Marks, di jiyana xwe ya şoreşgerî de gelek zehmetî jiyan kirine?

WANE 2

KOMUNA PARÎSÊ

Kapîtalîzma sedsala 19’an a ku bi navê kapîtalîzma hovane tê zanîn, bi şêweyekî bêsînor û bilez belav bûye. Di wê demê de di navbera bûrjûwaziya ku nûnertiya çîna serdest a pergala kapîtalîzmê dike û beşên civakî yên din de nakokiyên kûr ên; aborî, civakî, çandî û ramyarî hene. Ev serdem; bûye sedsala serhildanan, an jî weke bihara gelan tê binavkirin.

Serhildana Yolyo

Dema ku Şoreşa Fransayê dest pê kir, hemû navendên civakî di tevahiya Fransayê de pê rabû. Li Fransayê, bandora serhildaneke biçûk, belavî her deverê dibe. Li Fransayê, di sala 1830’î de serhildana Yolyo, cara yekem bi daxwazên civakî hatiye pêşxistin û bi çewisandineke pir bi xwînxwarî hatiye astengkirin.

Li Fransayê, serhildana ku belavî gelek qadan bûye û bi asteke mezin gihîştiye armanca xwe, serhildana 14 Sibata 1848’an e. Ev serhildan, li Parîsê pêş dikeve û belavî tevahiya Ewrûpayê dibe.

Serhildana 1848

Ev serhildan, di hin bajarên Ewrûpayê yên pîşesaziyê de diyar dibin. Di 13’ê Adarê li Viyanayê û di 18’ê Adarê de li Berlînê gel serhildanên mezin çêdikin, di 10’ê Nîsanê de gel li Îngîlîstanê xwepêşandanên mezin pêş dixin. Di destpêka gulanê de li Îtalyayê serhildaneke gel rû dide.

Hemû gelên Polon, Macar, Prûsya û Nemsa(Awusturya) û Silav(Sirp, Çek, Kirwat, Bulgar) ji bo azadiyê di rewşa serhildanan de ne. Di nava hemû serhildanên Ewrûpayê de ya herî zêde encam jê tê girtin, serhildana Fransayê ye. Bi vê serhildanê;

- Dengên giştî di Fransayê de tên pejirandin.
- Demjimêra kar, dadikeve 10 demjimêran.
- Di dîroka Fransayê de dema komara duyem piştî komara yekem a pergala qraltiyê tê eşkerekirin. Ev dem, bi serweriya **Louîs Bonapart** ku biraziyê Napolyon Bonapart e, ta 1852'yan berdewam dike. Piştî vê demê, bi zordestî û dîktatoriya xwe, dibe împaratorê Fransayê ta sala 1870' yî.

Louîs Bonapart

Louis Bonapart, ji bo ku xwe bigihîne sînorên dema apê xwe, di 19'ê Tîrmeha 1870'yî de li dijî Elmanyayê şer dike. Ev şerê di 6'ê Tebaxê de dest pê dike ta 2'yê Îlonê û Fransa di şerê Sîdanê de bi bin dikeve. Ev binkeftin, bi xwe re dema komara sêyem(1871-1940) aniye. Elmanya bi serkeftina şer têr nabe û Fransayê desteser dike. Fransa, di Çileya 1871'ê de radestî Elmanyayê dibe.

Tevî ku Komara Fransayê radest dibe û agirbest tê ragihandin, beşek ji mirovên neteweyî vê agirbestê napejrînin û Parîsê li hemberî Elmanyayê diparêzin. Vê carê, ji bo ku Komara Elmanyayê vê berxwedanê bişikîne, artêşa Fransayê bi ser van berxwedêran ve dişîne. Lê ew leşkerên ku ji bo şikandina berxwedanê tên şandin, bi berxwedanvanan re dibin yek û rêveberiya Parîsê, komar, hemû sazî û dezgeh dikevin destên wan. Piştî ku bajarê Parîsê dikeve destê Komîta Berxwedanê, karê yekem ê ku tê kirin (18'ê Adara 1871), hilbijartineke ku tevahiya gel dengê xwe bi kar tîne, tê

Louis Auguste

çêkirin. Di encama hilbijartina 21’ê Adarê de encûmena Komuna Parîsê bi karker, rojnamevan, bijîşk, karmend, guhartinxwaz(reformîst), radîkal, anarşîst û hemû beşên civakî; nûneriya xwe di nava wê de dibînin. Ji bo serokatiya encûmena komunê jî, Lûwîs Agûst Blanko(Louis Auguste Blanqui) tê hilbijartin. Komuna 16’ê Adarê tê sazkirin û di 28’ê Adarê de tê ragihandin. Di demeke pir kin de zagonên bingehîn tên derxistin:

- Darvekirina mirovan (giyotîn) tê rakirin.
- Leşkeriya neçarî tê rakirin.
- Mûçeyên karmendan, li gorî keda wan were dayîn.
- Dêr, ji yekdestiya dewletê tê derxistin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Pergala kapîtalîzmê, di sedsala 19’ an de bi çi awayî belav bûye?
2- Li Fransayê serhildana ku belavî gelek qadan bûye û gihîştiye armanca xwe, diyar bike?
3- Encamên ku ji serhildana 1848’an a Fransayê tên girtin, binivîse.
4- Çima Fransa, di 19’ê Tîrmeha 1870'yî de li dijî Elmanyayê şer dike?
5- Piştî ku bajarê Parîsê dikeve destê Komîta Berxwedanê, karê yekem ê ku tê kirin çi ye?
6- Zagonên bingehîn ên Komuna Parisê, binivîse.
7- Encûmena Komuna Parîsê, ji kîjan pêkhateyan ava bûye?
8- Kengî komara duyem û sêyem ên Fransayê, hatine ragihandin?

WANE 3

ŞOREŞA RÛSYAYÊ - 1

Yekem şoreşa ku bi navê bindestan hatiye çêkirin û marksîzm bingeha xwe jê digire, Şoreşa Rûsyayê (24’ê Cotmeha 1917) ye. Di encama vê şoreşê de pêşengiya pergala dewletê, dikeve destê Partiya Bolşevîk a bi navê bindestan û pergala dewletê tê guhartin; ji pergala burjûwaziya qeyseriyê derbasî komunîzmê dibe.

Rewşa Beriya Şoreşê

Rûsyaya Qeyserî, Împaratoriya Osmaniyan û împaratoriya feodal, pergalên herî mezin ên sedsala 20'an in. Her çi qas xwestibin bi bandorên Ewrûpayê re xwe biguherînin jî, xizanî û birçîbûn bûn taybetmendiyên gelê Rûsyayê yên bingehîn. Ev tengasî, dibin sedem ku hizirên sosyalîst bi awayekî zêde derkevin holê.

Di tevahiya sedsala 19’an de tevgera gelan (narodnîkan; ji xwendekar, bijîşk û mamosteyan) ku li hemberî qeyser têkoşîn dikir, cihekî girîng digire. Ji aliyekî ve têkoşîna narodnîkan û ji aliyê din ve Rûsyaya xwedî hizira sosyalîst, qeyser gelekî tengav dikin.

Qeyser Nîkolayê Duyem

Ji bo kêmkirina demjimêra xebatê ya karkeran û sererastkirina şêweyê jiyana gel, têkoşîneke pir mezin tê dayîn. Di 9'ê Îlona 1905’an di tevahiya Rûsyayê de dev ji kar berdanek (grevek) tê destpêkirin. Ev grev, Rûsyaya qeyser felc dike. Ji ber vê yekê, leşkerên qeyser gulebaranê li ser kesên ku çûne grevê dest pê dikin û kuştinê pêk tînin. Ev bûyera ku di dîroka Rûsyayê de weke yekşema bixwîn tê zanîn, Qeyser zêdetir tengav dike. Qeyser Nîkolayê 2. ku li hemberî gel êdî nikare li ber xwe bide, di sala 1906’an de bi

derxistina zagona pergala pirpartî û parlementeriyê (Encumena Dûma ya Împaratorî) eşkere dike.

Qeyser, piştî demekê di sala 1916’an de venêrînê pêk tîne û dixwaze wê zagona ku parlemento saz kiriye, pûç bike. Lê li hemberî vê daxwaza qeyser, gel têkoşînê bilindtir dike. Bi taybetî, sererastkirina mûçeyan ku bi awayekî dadwerî were belavkirin. Lê belê, qeyser nêzî vê nabe. Li ser vê yekê, gel protestoyan derbasî kolanan dike, di 8'ê Adarê roja jinên kedkar ên cîhanê de her çi qas çalakî bi awayekî aştiyane dest pê kiribin jî, bi destlêwerdana qeyser digihêje asta rijandina xwînê.

Serokê parlementoyê ku ji têkoşîna gel a kolanan hêzê digire, li hemberî qeyser darbeyê pêk tîne û dest datîne li ser rêveberiyê. Li şûna pergala qeyser, rêveberiyeke lîberal pêş dixe (Sibat 1917).

Pêşketina Şoreşê û Encamên Wê

Di vê pêvajoyê de Lênîn, li welatên Ewrûpayê digere. Bi gelek avakerê sosyalîst û çalakvanan re naskirin çêdibe û ji partiyên wan bandor dibe. Lê belê, lasayî nake. Her çi qas ji van bandor bibe jî, ew rê û xeta (ramyariya) xwe xêz dike.

Marks dibêje; divê mirov bigihêje zanîna çîna proleteryayê, ji ber ku bi gihîştina vê zanînê re wê şoreş pêk were. Lênîn, vê gotina Marks cardin şîrove dike. Li gorî Lênîn, divê zanîna proleteryayê were veguhastina ji derve. Li gorî vê, xeta xwe ya şoreşê xêz dike.

Aleksander Kerensky

Dema ku Lênîn li Siwêdê bû, li hemberî qeyser darbe çêdibe. Lê Lênîn daye xuyakirin ku wê bi tu awayî komara nû nas neke, di nava vê komara ku hatiye sazkirin de cih negire û ji komara nû re nebe alîkar. Lênîn, bi dizî tê Rûsyayê. Di nirxandineke xwe ya sala 1917’an de bi gotina; “**dibe ku îro zû, sibe dereng be**” hestyariya xwe ya ji bo pêvajoyê diyar dike.

Ev nirxandinên wî, piştre di pirtûkan de tên nivîsandin û di dîroka Şoreşa Rûsyayê de cihekî girîng digirin. Li hemberî komara Aleksander Kerensky, serhildanê dide destpêkirin. Kerensky, bi qeyser re li hev dikin û serhildanê radiwestînin. Lênîn, neçar dimîne ku careke din derkeve derveyî welat. Nêzî sê mehan û şûn de careke din vedigere Rûsyayê. Bi vegera xwe ya welat re banga greveke giştî dike.

Gel û karkerên ku vê bangê guhdar dikin, ji kargehan derdikevin; qesra qeyser û avahiya komarê desteser dikin. Ev çalakî, nêzî hefteyekê didome. Qeyser Nîkolayê 2. xwe ji text vedikişîne. Bi vî awayî, bandora qeyser a li ser Rûsyayê bi dawî dibe.

Qeyserê ku ji malbata Romanov e, ew û hemû malbata wî tên girtin, kuştin û komara nû tê eşkerekirin. Komara Kerensky tê hilweşandin. Li şûna qeyser, bi Serokatiya Lênîn ve komareke nû tê damezirandin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Şoreşa ku bi navê bindestan hatiye kirin û marksîzm bingeha xwe jê digire, çi ye û encamên wê çi ne?

2- Di dema Rûsyaya qeyserî de taybetmendiyên bingehîn ên gelê Rûsyayê çi ne?

3- Çawa pergala qeyser di sedsala 19’an de hatiye tengavkirin?

4- Çima di sala 1905’an de li tevahiya Rûsyayê grevek tê destpêkirin?

5- Dema ku Rûsyaya qeyser felc û tengav dibe, kîjan zagon tên derxistin?

6- Sedema bingehîn a Şoreşa Rûsyayê, diyar bike.

7- Çima Marks dibêje; divê mirov bigihêje zanîna çîna proleteryayê?

8- Çawa bandora qeyser a li ser Rûsyayê, hatiye bidawîkirin?

WANE 4

ŞOREŞA RÛSYAYÊ – 2

Stalîn **Lênîn** **Troçkî**

Lênîn, hevalê xwe yê têkoşînê Liyon Troçkî (Leon Troçkî) di wezareta karê derve de bi cih dike. Bi Elmanan re peymana aştiyê ya Brest-Lîtovsk mohr dike û ji şerê cîhanê yê yekem vedikişe. Lê di nava Rûsyayê de pirsgirêkên hundirîn kûrtir dibin û berdewam dikin. Ev şerê hundirîn, nêzî çar salan didomin. Di dawiya vî şerî de careke din, Lênîn komara xwe ava dike.

Der barê mirina Lenîn de nêrîn û agahiyên cuda yên weke; ji ber nexweşiyê, bi reşkujiyekê, yan jî bi jehrkirinê ve miriye, hene. Di 21’ê Çileya 1924'an de dimire.

Dema ku Lênîn mir, di Yekîtiya Sovyetan de yek Partiya Komunîst heye, ew jî li ser desthilatdariyê ye. Piştî mirina Lênîn, sekreterê partiyê Stalîn dibe serokê dewletê. Troçkî, di destpêkê de piştgiriyê dide Stalîn. Lê dema ku Stalîn dev ji rêbazên Lênîn berdide û li şûna dewleta demokratîk, ber bi dewleteke burokratîk ve diçe, li hemberî wî dijberiyê dike. Stalîn, gav bi gav Troçkî tenê dihêle û hemû karên di destê wî de digire û di sala 1928’an de wî mişext(sûrgin) dike. Troçkî, li

Meksîkaya ku lê hatiye mişextkirin, ji aliyê sîxurên Sovyetê ve tê kuştin.

Bi vî awayî, Stalîn her ku diçe cuda dihizire û kesên dijber ji partiyê dûr dixe. Bi navê paqijkirina navxweyî; girtin û binçavkirin, digihêjin hezarê kesan. Gelek kes tên girtin û dadgehkirin. Beşek ji van ên girîng tên kuştin.

Peymana Yalta
(Churchill-Roosevelt- Stalin)

Di sala 1939’an de bi Hîtler re peymana êrîşnekirinê mohr dike. Lê Hîtler piştî ku rewşa xwe saxlem dike û alîkariyê ji derve digire, êrîşî Yekîtiya Sovyetan dike. Şerê Cîhanê yê Duyem, bi kuştina 20 milyon mirovên ku ji Rûsyayê ne, bi encam dibe.

Stalin, piştî Şerê Cîhanê yê Duyem bi dewletên emperyalîst (Îngilîz, Emerîka, Fransa) re Peymana Yalta ya ku şerê germ bidawî dikin û şerê sar didin destpêkirin, mohr dike. Ev rewş, ta sala 1990’î belavbûna Yekîtiya Sovyetan berdewam dike.

Yekîtiya Sovyetan, di sala 1986’an de bi serokwezîrê wê demê Mihail Gorbaçov re dixwaze hin daxuyaniyan bide. Ev daxuyaniyên vekirinê yên bi navê Glasnost û Perestroyka ku nagihêjin serkeftinê û tengasiyên Sovyetan ên aborî, ramyarî, civakî û hwd. ku jiyan dikir, kûrtir dibin. Di sala 1991’ê de di 26’ê Îlonê de Yekîtiya Sovyetan parçe dibe. Bi vî awayî, Şoreşa Rûsyayê ya ku bi pêşengiya Lênîn di 1917’an de dest pê kiribû, bi dawî dibe,

Şoreşa Rûsyayê, şoreşeke ku divê gelek aliyên wê werin lêkolînkirin û encam jê werin derxistin. Ezmûna yekem a ku were derxistin: Bi çek û paradîgmaya serweran ve têkoşîn li hemberî desthilatdariya heye, nayê meşandin.

Ezmûneke din a ku ji Şoreşa Rûsyayê were derxistin; pirsgirêk bi desteserkirina dewletê re çareser nabin û bi derbaskirina pergala dewletî re wê bên çareserkirin. Tevî ku hatiye warê pergaleke pir mezin jî, lê ji pirsgirêkên hene re nebûye bersiv. Vê rewşê, di Şoreşa Rûsyayê de xwe daye der.

Di çavkaniya pirsgirêkan de desthilatdariyeke hişk heye ku pêşiyê li pêşketina civakê digire. Ji ber vê yekê, li şûna avanîsaziyên navendî û burokratîk ên dewletî, divê komunên xwecihî û demokrasî werin avakirin. Lewazmayîna demokrasiyê; bi qasî ku gel bihêz nake, şoreşê ji hêza gel bêpar hiştiye.

Kapitalîzm, weke nexweşiyekê vedigire şaneya ku pê ve digire, tune dike û belav dibe. Ev, ji bo civakê jî wiha ye. Ji ber vê yekê, li şûna ku bi kapîtalîzmê re hevrikî were kirin, divê were armanckirin ku kapîtalîzm were derbaskirin.

Ji ber ku ji aliyê paradîgmayê ve di qadên weke; jin, parastina xweza û demokrasiyê de veguhertinên rast nehatine pêşxistin û ev jî kêmasiyeke Şoreşa Rûsyayê ya cidî ye.

Lê belê her çi qas guhertinên mezin nedabe çêkirin jî, yek ji çavkanî û mîrateyên mezin ên civaka sincî û polîtîk in.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Bi dawîbûna şoreşa Rûsyayê re Lênîn di destpêkê de kîjan biryar pêk aniye?

2- Çima Troçkî, li hemberî Stalîn dijberiyê dike?

3- Dewlet di destpêka dema Stalîn de çawa dihat birêvebirin?

4- Peymana Yalta, di navbera kîjan dewletan de tê mohrkirin û tê çi wateyê?

5- Kengî û çima Yekîtiya Sovyetan parçe bûye?

6- Encamên ku divê ji Şoreşa Rûsyayê werin derxistin, çi ne?

7- Li şûna avanîsaziyên navendî û burokratîk ên dewletî, divê çi were avakirin?

8- Kêmasiya Şoreşa Rûsyayê ya cidî çi ye?

WANE 5

TEVGERÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ

Kapîtalîzma ku di navenda Îngilîstan û Holandayê de mezin bûye; piştî van welatan, li gelek welatên Ewrûpayê jî bi lez û berfireh pêş ketiye û gihîştiye pergalekê. Di pêşketina yekem a kapîtalîzmê de kapîtalîzma bazirganî(merkantîlîzm), weke pêwîstî bazaran zêdetir dikir. Ev jî dibe sedema pêşketina bilez a van welatan û dagirkirina welatên derdorê. Di destpêka sala 1900'î de tu bejahiya ku nehatiye vedîtin, nemaye. Dewleteke ku nehatiye parvekirin, nemaye. Di Şerê Cîhanê yê Duyem de ji derveyî armanca ji nû ve parvekirina cîhanê, tiştekî din tune ye. Bi kurtasî, di destpêka sala 1900'î de hemû welatên cîhanê ji aliyên çend welatên emperyal ve hatine dabeşkirin û dagirkirin. Neteweyên ku di rewşa mêtîngehan de jiyan dikirin, ji hemû mafan bêpar mabûn.

Şoreşa Rûsyayê; pêvajoyeke nû ya dîroka mirovahiyê, pêvajoya serdema şoreşan dida destpêkirin. Şoreşa Cotmehê, di heman demê de qonaxa şerên têkoşîna rizgariya neteweyî ya neteweyên mêtîngeh, dida destpêkirin.

Pir gelên ku li ser bingeha mafê çarenûsa xwe bi xwe diyar kirin, têkoşîn dikirin. An wê ji dewletê qut bibin, an jî wê dewleteke cuda ava bikin. Ji wê demê û şûn de hemû partiyên ku dixwestin dawî li dagirkeriyê bînin û rizgariya neteweyan pêk bînin, bi navê tevgerên rizgariya neteweyî hatin binavkirin. Sedsala 20'an, sedsala tevgerên rizgariya neteweyî yên bibandor in. Weke şoreşên; Çîn, Cezayir, Hindistan, Vietnamê û hwd.

Tevgerên rizgariya neteweyî, bi armanca rizgariya ji serweriya emperyalîst, derketibûn ser dika têkoşînê. Piştî Şerê Cîhanê yê Duyem, bi taybetî tevgerên rizgariya neteweyî di sala 1960'î de pêş ketin û di bin banê **Neteweyên Yekbûyî** de kom

dibûn û dibûn dewlet. Lê dema ku dibûn dewlet, ji armancên xwe yên têkoşînê dûr diketin. Dibe ku welatê xwe ji êrîşên derve rizgar kiribin, lê pergala serwer, desthilatdarparêz, zayendparêz derbas nekirin. Jiyan, azad nekirin. Demokrasî, saz nekirin. Gel, di wateya rastiyê de neanîn asta jiyan û hêzê. Di encamê de bûn mezhebeke ku temenê pergala emperyalîst û kapîtalîzmê dirêj bike. Nikaribûn xwe ji vê rizgar bikin. Jixwe niha di nava van dewletên ku bi têkoşîna rizgariya neteweyî hatine sazkirin de pirsgirêkên weke; demokrasî, azadî, wekhevî û dadî jiyan dibe.

Neteweyên Yekbûyî

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Pergala kapîtalîzmê, di navenda kîjan dewletan de pêş ketiye?
2- Di destpêka sala 1900'î de hemû welatên cîhanê çawa dihatin xuyakirin?
3- Neteweyên ku di rewşa mêtîngeh de jiyan dikirin, çawa dihatin dîtin?
4- Kengî û çawa tevgerên rizgariya neteweyî, bûn dewlet?
5- Çima dema ku tevgerên rizgariya neteweyî dibûn dewlet, ji armancên xwe yên têkoşînê dûr diketin?

WANE 6

ŞOREŞÊN RIZGARIYA NETEWEYÎ

Şoreşa Çînê

Sut Yat Sen

Piştî Şoreşa Cotmehê, cihê yekem ê ku jê bandor bûye, Çîn e. Ji nîvê sedsala 19'an û şûn de hevrikiya li ser bazara Çînê dijwartir dibe û di Çînê de kapîtalîzm di vê demê de pêş dikeve. Ji kevn ve li ser Çînê, dewletên weke; Japonya, Îngiltere û Fransa di nava hevrikiyê de ne.

Şoreşa Çînê, di sala 1911'an de bi **Komintang Sut Yat Sen** ê ku li hemberî serweriya xanedanan derketiye û hilweşandiye dest pê kiriye û bi têkoşîna gelan re bi encam bûye.

Di sala 1937'an de dema ku Japonya xwest hemû Çînê desteser bike, di navbera Komintang û komunîstan de aştî çêdibe û bi dirûşmeya; "**Çînî; ne bi çîniyan re, divê bi Japonan re têbikoşin**." dest bi têkoşînê dikin.

Di Şerê Cîhanê yê Duyem de bi binketina Japonyayê re Çîn jî, ji serweriya Japonyayê rizgar dibe.

Piştî radestbûna Japonyayê û ji bo ku komunîst li Çînê nebin pêşeng, di serî de Emerîka û hêzên din ketin nava hewldanên mezin û li dijberî Partiya Komunîst A Çînê piştgirî dan Komintang. Di navbera **Çan Kay Şek** ê ku alîkariya mezin ji Emerîkayê girtibû yê Komintang û Partiya Komunîst A Çînê de di sala 1947'an de şerê hundirîn derdikeve. Beriya niha jî, di navbera salên 1924-1927 û 1927-1937'an de şerên

Çan Kay Şek

navxweyî yên demdirêj hatine jiyankirin. Lê yên vê care, yên dawî ne. Yê ku qezenc dike, Partiya Komunîst a Çînê ye. Komara gel a Çînê; piştî serkeftina Partiya Komunîst A Çînê, di 1'ê Cotmeha 1949'an de tê sazkirin. Pêşengê şoreşê Mao; Marksîzmê, li gorî şert û mercên Çînê, vediguherîne. Li gorî stratejiya şerê gel ê demdirêj, ava kiriye. Şoreşê bi ser dixe û girîngiyeke pir mezin dide perwerdeya gel.

Mao Zedong

Ji aliyê din ve ji bo ku bigihîje armanca şoreşê; di sala 1964'an de bi navê şoreşa çandê, seferberiyê dide destpêkirin. Mao; dewleta Çînê ya ku xwedî şêniya herî zêde ya welatê cîhanê ye, bi sosyalîzmê daye naskirin. Li wê derê, bi avakirina komara gel re di wateya rastî de xwestiye ku gel bigihêje hêza xwe. Piştî ku Mao jiyana xwe ji dest da, Çîn pir zêde dikeve nava pergala kapîtalîzmê, yan jî ji aliyê vê pergalê ve tê kişandin. Îro Çîn, di rewşa dewleta herî bingehîn de ya ku pergala kapîtalîzmê, wê li ser piyan dihêle.

Şoreşa Cezayirê (1954-1962)

Ev şoreş, bi navê milyon pakrewanî jî tê nasîn. Ji ber ku milyonek mirovî jiyana xwe ji dest daye. Şoreşa Cezayirê, ji aliyê eniya rizgariya neteweyî ve li hemberî serdestiya Fransayê pêş ketiye. Ji ber ku Cezayir di bin serweriya Fransayê de bû. Serfiraziya şoreşê, di encama şerê gerîla de tê bidestxistin. Serokomarê yekem ê Cezayirê, Ehmed Bin Bêla ye.

Ehmed Bin Bêla

Serjimêra Cezayîrê, 9 milyon in. Di wê demê de di şer de milyonek mirovî jiyana xwe ji dest da. Di 1'ê Tîrmeha 1962'yan

de bi dengdayîna gel (referandûmekê) re gelê Cezayîrê bi yek dengî biryara serfiraziya xwe da. Fransaya ku êdî nikare dagiriya xwe di nava Cezayirê de bimeşîne, ji neçarî vê biryarê dipejirîne.

Şoreşa Vietnamê



Ho Chi Minh

Vietnam, ji sala 1858'an ve dikeve bin dagirkeriya Fransayê. Di sala 1940'î de di Şerê Cîhanê yê Duyem de Hîtler dikeve Fransayê, Japonya jî dikeve Vietnamê. Fransa vê ketinê dipejirîne.

Di vê demê de Vietnamî di destpêkê de li hemberî Japonan dikevin nava berxwedanê. Berxwedana ku di sala 1940'î de dest pê dike, ta sala 1945'an didome û Vîetnamî bi ser dikevin. Di 2'yê Îlona 1945'an de ji aliyê Ho Chi Minh ve Komara Demokratîk a Vietnamê tê ragihandin.

Vo Nguyen Giap

Piştî ku ji dagirkeriya Japonyayê rizgar dibe, dor tê dagirkeriya Fransayê. Şer; di Kanûna 1946'an de bi êrîşa Giapê xwedî mejiyekî mezin dest pê kir û di Gulana 1954'an de bi êrîşa Dên Bên Fo(Dien Bien Phu) bi dawî dibe. Di encama van serkeftinên gel de, di konferansa Cenev ya sala 1954'an de Vietnam, weke bakur û başûr tê dabeşkirin. Li başûr, Komara Vietnamê hat sazkirin. Giap, di sala 1960'î de bi armanca yekîtiyê, artêşa gel ji bo alîkariya eniya rizgariya neteweyî ya Vietnama Başûr, ji başûr re tê şandin. Wê demê hêzên xwedî amûrên teknîkî û mezin, bi alîkariya Emerîka û 500 hezar leşkerî ve li benda hêzên Gîap tên rawestandin. Di navbera wan de şerekî demdirêj û gelekî zor rû dide, di encamê

de hêzên Vietnamê bi ser dikevin. Vietnam, di sala 1976’an de bi tevahî ji dagirkeriyê tê rizgarkirin û dibe komareke hevgirtî.

Pêşengê şoreşê; Ho Chi Minh e.

Fermandarê pêş; Giap e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Kîjan dewlet, hevrikiyê li ser bazara Çînê dikin?
2- Şoreşa Çînê, ji aliyê kê ve li hemberî serweriya xanedanan derketiye?
3- Kengî Komara Gel a Çînê tê sazkirin?
4- Pêşengê şoreşê Mao, piştî serkeftinê li ser Komintang di sala1949'an de çi karî dike?
5- Şoreşa Cezayirê, li hemberî kîjan dewletê û çima şer dike?
6- Kengî Fransa, di şerê Vietnamê de hatiye binxistin?
7- Encama Konferansa Cenevê ya di sala 1954'an de ya ji bo Vietnamê, diyar bike.
8- Çima Giap, di sala 1960’î de artêşa gel ji Vietnama Başûr re şand?
9- Kengî Vietnam bi tevahî ji dagirkeriyê tê rizgarkirin û dibe komareke hevgirtî?

BEŞA 3

DI NAVA CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC

1- DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC - 1

2- DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC - 2

3- DI DEMA ŞARISTANIYA KOLEDAR DE KURD

4- DI ŞARISTANIYA FEODAL DE KURD

5- DI ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE KURD - 1

6- DI ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE KURD - 2

7- ÇANDA BERXWEDAN Û XIYANETÊ

8- ÇANDA NETEWEYA DEMOKRATÎK - 1

9- ÇANDA NETEWEYA DEMOKRATÎK - 2

10- RÊGEZÊN NETEWEYA DEMOKRATÎK

WANE 1

DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC – 1

Kurd, ji aliyê koka xwe ve gelê herî kevnar e; watedarkirina jiyana civaka kurd hêsantir e. Çiya, çandinî û lawirvanî bi kurdan re hevpar e. Bajarvanî; weke têgeh, ji kurdan dûr e. Lê gundîtî, yan jî çanda gund; di dîrokê de yek ji pêngavên ji aliyê civakî ve ya herî kevn e ku ji aliyê pêşiyên kurdan ve hatiye destnîşankirin. Kurd, çi qas gundî bin; ew qas ji bajaran dûr in.

Bajar, piraniya xwe ji aliyê dagirkeran ve hatine sazkirin û tejîkirin. Ev nayê wateya ku kurdan tu carî bajar saz nekirine û nebûne xwedî şaristanî. Tê zanîn ku di destpêkê de dewletên weke; Ûrartû, Kasît, Med, Mîtanî û gelek şaristaniyên bajaran ji aliyê kurdan ve hatine damezirandin. Di serdema navîn de jî komarên bajar û eyaletan damezirandine, weke; Komagene. Lê ji ber ku nebûne dewlet û komarên demdirêj, bajar piraniya xwe bûne biryargehên(navendên) dagirkeran û civak jî derdora wan pêk anîne.

Komagene (250 B.Z-100 P.Z)

Dema ku di serdemên destpêkê de Sumer, Asûr, Aram, Pers û bandorên Helen(Yewnanistan); mohra xwe li berhemên nivîskî yên çandî û bajarvaniyê dixistin, di serdema navîn de çand û zimanê erebî û farisî şopa xwe jî hiştibûn. Gelek nivîskar, rewşenbîr, rêveber û fermandar; di ziman û çanda cîranan de rist lîstine.

Her çi qas zimanê kurdî, xwedî kokeke kevn û bingeheke çandî ye jî, lê ev ziman neketiye rewşa nivîsîn û pêşketinê. Weke zimanê din, nebûye zimanê tu dewletan jî. Tevî ku çanda kurdan, bi riyên cuda ji ber hebûna xwe ya etnîkî û bermahiyên wê yên dîrokî, karibûye ta roja me xwe biparêze.

Çand û zimanê kurdî, li gorî gelek şûnwarnasan, li quntarên çiyayê Toros-Zagrosê, weke ziman û çanda şoreşa neolîtîkê hatiye destpêkirin û bi demê re bûye bingeha çand û zimanê Hind-Ewrûpiyan.

Tê dîtin ku ji beriya 9000 salî ve di erdnîgariya Mezopotamyayê de belavbûnek çandî jiyan kiriye. Çêbûna vê ta 15000–10000 sal B.Z. ye. Etnîsîteya kurdî, di sala 6000 B.Z. de pir baş diyar dibe. Tê dîtin ku di salên 6000 B.Z. de Hûrî neolîtîkê sazûman dikin û çanda Til Xelefê ava dikin û di rewşa berdewamiya wan civakan de ne.

Hûrî, cara yekem di 3000 B.Z. de ji aliyê Sumeran ve bi navê Horît ku tê wateya “çiyayî” hatine binavkirin. Piştre, weke; Gûtî, Mîtanî û Kasîtî tên binavkirin ku ziman û çandeke hevbeş parve dikirin.

Civaka kurdan; çandeke kûr, kevn û cîhanî ye. Her ku diçe ji aliyê zanyarên civakî ve tê rastandin. Ji ber ku yê ji çanda neolîtîkê re malovanî kiriye, wê ji hemû komên mirovan re çandeke sergihayî belav bike û di rewşa nasnameya etnîsîteyê de be.

Çandên civakî yên kurdan, ji cihwarbûnê dest pê dikin û dibin xwedî nasname. Tê zanîn ku di dîrokê de çanda gund û çandiniyê; çanda civakî ya herî kevn e. Cîhana me ya îro jî, di rêjeyeke mezin de li ser çanda gund û çandiniyê hebûna xwe diparêze. Taybetiya vê çanda civakî ya herî girîng, di bingeha komên biçûk de di nava hev de jiyan kirin û bi qasî ku têra wê bike, xakê bi kar tîne û ji bo jiyana xwe dest bi çandiniyê dike. Her wiha, debara xwe ji çandiniyê pêk tîne, ango jiyaneke

niştecihî ye. Gund û çandinî, di dîroka mirovahiyê de cara yekem ji aliyê mirovan ve ji qonaxa klanan derbasî jiyana niştecihî bûne. Ji ber vê yekê, ji şoreşa destpêkê ya herî mezin re şoreşa çandiniyê tê gotin. Di heman demê de ew komên ku bi girêdana xwînê, xwedî rêxistineke eşîrî û li ser nasnameya etnîsîteyê ne, nasnameyeke nû ya civakî çêdike.

Çanda gundîtî, çandinî û eşîrtiyê; jiyana komînal derdixe holê. Çanda çandiniyê; bi hev re alîkarbûn, xebatkirin, parvekirin, hevbeşbûn, jiyankirin; têgeha yekîtiyê bi neçarî bi xwe re tîne. Di komên klan de jiyaneke hevbeş a diyar heye. Lê ev ne demdirêj û belav e, lê gund û çandinî xwedî tevgerên civakî yên ku kesên civakê bi tevahî tîne gel hev û bi hev re dide jiyankirin û têkiliyan çêdike.

Kurd, bi tevahî tiştên ku hatine diyarkirin, di pêkhatina eşîrtî, gundîtî, çandinî û civakbûnê de risteke sereke lîstine. Îro jî civaka kurd; şopên jiyana kevn, ango jiyana xwezayî pêk tînin.

Jiyana kurdan, di gundan de hîna jî taybetmendiyên xwe diparêze, çanda jiyanê hîn jî berdewam dike û weke şaristaniyekê tê dîtin. Tevî ku taybetmendiyên civaka komunal hîn jî di hundirê xwe de diparêze. Ev ne ji ber nûjenî û kapîtalîzmê ye, ji ber di nûjeniyê de her çi qas bi sedê salan têkoşîn berdewam kiribe jî, di civakên din de kapîtalîzmê çawa derbas kiriye, lê di civaka kurdan de qet nekariye derbas bike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çanda gund, di dîrokê de ji aliyê kê ve hatiye destnîşankirin.
2- Çend dewlet û şaristaniyên bajaran ên ku ji aliyê kurdan ve hatine damezirandin, binivîse.
3- Çawa kurdan kariye çanda xwe ta roja me biparêzin?
4- Li gorî gelek şûnwarnasan, çand û zimanê kurdî bi çi awayî hatine dîtin?
5- Kengî etnîsîteya kurdî di dîrokê de baş hatiye diyarkirin? Mînakekê li ser wê bide.
6- Taybetmendiya herî girîng a çanda civakî ya kurdan, diyar bike.
7- Çima ji şoreşa destpêkê ya herî mezin re şoreşa çandiniyê tê gotin?
8- Çanda gundîtiyê, têgeha yekîtiyê bi neçarî çawa pêk aniye?
9- Çima kapîtalîzmê qet nekariye jiyana civaka kurd derbas bike?

WANE 2

DI CIVAKA KURDAN DE ÇAND Û SINC – 2

Gundê Til Cîhanê

Di civaka kurdan de li hemberî nûjeniyê, her çi qas bi xwe jî ne di têkoşîna li hemberî wê be jî, xwedî rewşeke têkoşînê ye. Gundên kurdan, li hemberî bajarvaniya pergala kapîtalîzmê, xwedî li çanda xwe ya komun, sincê xwe yê hevbeş û hezkirinê derketiye. Li hemberî pergala nûjeniyê ya ezezî û sermiyana taybet; hevbeşbûn û bi hev re jiyanbûnê derdixe pêş.

Di civaka gundan de ger pirsgirêkên mirovan ji aliyê birçîbûn, ewlekarî û jiyanî ve derkevin, ev pirsgirêk ji bo civaka gund, şerm û rûreşiyeke mezin e. Di jiyana hemû gundan de ev nêzîkatî hebû. Kurd, zêde tevlî çanda kesî ya nûjeniyê, sermiyana taybet û ezeziyê nebûne. Ji ber ku jiyana kurdan, di xwezaya gund û çiyayan de dihat dîtin û ev taybetmendiyên ku hatine diyarkirin, piranî yên civaka bajarî ne.

Civaka gundan a niştecihbûyî, bi sedê salan li hemberî pergala desthilatdar li ber xwe dide. Bajarbûn û deşta rast her tim bi pergalê ve girêdanê derdixe holê. Di lêkolînan de hatiye dîtin ku kurdên deştê, her tim bi pergalê ve tên girêdan. Ji ber vê yekê, berxwedêriya xwe car caran winda dikin.

Bajar û çanda bajaran, her tim şaristanî pejirandine û çanda çiya û gund her tim biyanî nirxandine. Çanda bajaran ku çandeke şaristanî(medenî) û pêşketî dihat dîtin, her tim çanda gundan biçûk, nezan, hov û nemirov dibîne. Yên xwe; şaristanî didîtin, ên derveyî xwe; bi taybetî yên gundan paşketî û xwe jî weke afirîner û efendiyên vê cîhanê dibînin. Bajarî yên ku

fermanan didin, lê yên derveyî bajaran ên ku ferman li wan tên kirin.

Ger kurd, her tim weke civakeke jêr an jî kêm hatibe dîtin, ew jî ji ber ku nêzîkbûna wan ji çanda bajaran dûr e.

Kurdan jî bajar afirandine, lê bi hişmendiyeke desthilatdar nêzîk nebûne. Weke bajarên; Hûrî, Mîtanî û Medan bi demê re derveyî şaristaniyê mane, tenê di geliyên(newalên) çiyayan de û li deverên cihwarbûnê yên li ber çiyayan jiyan dikirin û hewl didan da ku cewher û hebûna xwe biparêzin.

Bi saya çiyayan, karîbû bibe gelê herî kevn û xwediyê vê nasnameyê. Aliyê vê yê neyînî jî ew e ku di nava xwe de zêde cih nedaye çanda bajêr. Bi bajêr re her tim di helwesteke dijber de maye û bajêr weke cinawirekî ku yê wî bixwe û daqurtîne, dîtiye. Ji ber vê yekê, çanda qebîle û eşîrê ta roja me ya îro hebûna kurdan parastiye. Şêweyê qebîle û eşîrê, şêweyê bingehîn ê çanda kurdan e. Çawa ku civaknasî çanda eşîrê dide nasîn, çandeke bi riya xwîn û xizimtiyê ye, lê tê zanîn ku çanda eşîrê, çandeke jiyana azad û şêwaza heyînê ye, bi berxwedana li dijî şaristaniyê re xwe diyar dike. Bi vî awayî danasîna wê, durist û rastir e. Li cem kurdan çanda eşîrê, gelekî bi hêz û xurt e. Ji ber ku tevahiya dîroka şaristaniyê, bûne xwedî vîn(îrade). Bi berxwedanê, xwedî li hebûn û jiyana xwe ya azad derdikevin. Di vê de têkiliya xwîn an jî xizimtiyê, ne diyarker e.

Di dîrokê de kurd, weke gelê bisinc û baş hatine nasîn û zanîn. Ev; ji Hûriyan dest pê dike, bi Medan bilind dibe û di etnîsîteya kurdan de digihêje nasnameyekê.

Mirovên kurd; mêrxas, merd, durist, bidad û rast in. Çi qas têgehên sinc ên baş diyar dikin jî, ji bo hemû gelan derbasdar e.

Hemû gelên ku bi kurdan re ketine nava têkiliyan, qala başiya sincê kurdan kirine. Dîroknasê yewnanî Heredot, ji beriya sê hezar salî ve sinc û şêweyê jiyana civaka kurdan, bi pesindayîna ji aliyê başiyê ve nikare wê bi dawî bike. Her gelê

ku di dîrokê de bi kurdan re bûye cîran û jiyan kiriye, yan jî yên hêzên dijmin û dewletê jî, heyranî li ser sincê civaka kurdan bûne, her tim pesnê kurdan dane.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Gundên kurdan bi çi awayî li hemberî bajarvaniya pergala kapîtalîzmê derketine?
2- Çima kurd, tevlî çanda kesî ya nûjentiyê, sermiyana taybet û ezeziyê nebûne?
3- Li gorî çanda bajaran, çanda gundan çawa dihat dîtin?
4- Çima gelê kurd, di geliyên çiyayan de jiyan dikirin?
5- Çima li cem kurdan, çanda eşîrtî gelekî bi hêz û xurt e?
6- Di dîrokê de kurd bi çi sincî hatine nasîn û zanîn?

WANE 3

DI DEMA ŞARISTANIYA KOLEDAR DE KURD

Di pêvajoyên destpêkê yên dîrokê de beşeke biçûk a civaka kurdan, xwestiye derbasî civaka bidewlet bibe. Çanda çînayetiyê ji derve tanîn û dixwestin bi zorê bi kurdan bidin pejirandin. Di dîrokê de şaristaniyên bidewlet ên Sumer, Asûr, Babil û Misirê serkêşiya koletiyê kirin û xwestin vê belav bikin.

Di dîrokê de weke çanda semîtîk jî tê nasîn. Çanda nêçîr û şivantiyê ku ji vê wêdetir bi çînayetî û zayendperestiyeke hişk ve hewl dane ku çanda çîna desthilatdar a civaka dewleta koledar belav bikin.

Di vê demê de pişaftina çandî, li ser kurdan tê sepandin. Di destpêkê de çanda desthilatdar a dewleta koledar a Asûr gihîştiye astekê. Her cihê ku dagir dike, çanda xwe ya koletiyê disepîne.

Asûriyan, çanda koletiyê belav kirin û weke Babil û Sumeran bûne dewleteke koledar. Her tim hatiye xwestin ku gelê kurd, bi van pergalan re bibe yek û xwestine wî bikişînin nava çanda xwe. Bi taybetî, li qadên rast, deşt û cihên ku pirsgirêka ewlekariyê lê heye. Ev, ji çanda zayendparêz û çînayetiyê re bingeheke destdayî ye. Ji ber vê yekê, di kurdan de pişaftin hêsan û berfirehtir belav bûye. Di civaka kurdan de yên ku herî zêde bi pişaftinê re rû bi rû mane, yên ku di cihên rast û deştan de jiyan dikirin.

Rista zimanê erebî ya di çanda kurdan de

Beriya erebî bi hezarê salan Akadî, Aramî û Suryaniya fermî, çand û zimanên hevpar ên împaratoriyên koledar ên kevnar, ji zû ve bi rista weke ya ku grekî û latînî li Ewrûpayê lîstibûn, rabibûn. Zimanê erebî, cara pêşî bi hatina îslamiyetê re bû zimanê hevpar ê çanda Rojhilata Navîn. Çanda

xanedaniyê jî bi erebî dihat ravekirin û li Rojhilata Navîn ji bo tevahiya arîstokrasiya îslamî, dibû çanda jiyana hevbeş.

Malbateke arîstokratîk a ku ji Rojhilata Navîn û tê de mezin dibû (di nava wê de kurd jî), tune bû ku koka xwe bi xanedaniyên ereb ve girê nedida. Her malbata arîstokratîk a hevkar, bi girîngiyeke mezin ve koka xwe bi xanedaneke ereb, bi taybetî ehlibeytê ve girê dida. Divê mirov li vî karwanî, çîna nû ya leşker û zanyaran jî zêde bike. Tevahiya wan jî ji xwe re kiribûn weke kevneşopiyekê ku kokên xwe yên berê mandel bikin û paşnavên nû li xwe bikin. Çanda farisî ya hezarê salan jî, di nava çand û zimanê erebî de hatiye pişaftin û nikarîbû xwe ji vê rizgar bike. Jixwe ziman û çandên qels, pir bi hêsanî hatine daqurtandin.

Çîna jor a eşîr û qebîleyên kurdan jî, ji vê yekparebûn û pişaftina bilez, para xwe girtin. Berdewamiya kevneşopiyên kevn ên Zerdeştî, ji sûdê zêdetir zirarê dide wan. Wateya pejirandina vê çandê, dibe ku mirin û windabûna hebûna wan be.

Di dîrokê de hatiye dîtin ku çînên serwer, li ser bingeha berjewendiyên xwe bi lez di nava çand û zimanê biyaniyan de dihelin û hebûna xwe bi vî awayî dewam dikin. Pêkhatina çîna serwer, li gorî vê ye.

Di navbera sedsalên 7 û 10’an de çîneke jor a kurdên hevkar a gelekî bi hêz di nava çand û zimanê arîstokrasiya ereban de hatiye pişaftin û pê re bû yek, pêk hat. Ev beşên ku em qala wan dikin, her çi qas ji aliyê teşe ve xwe kurd bibîne jî, di warê çand û ziman de her yek ji wan beniyekî ereban e. Van beşan, rûniştin û rabûna xwe ya bi zimanê erebî re weke nîşana ji malmezinekê dihesibandin û pê serbilind dibûn. Ev beşên ku herî zû dev ji

ziman û çanda xwe berda bûn, li Kurdistanê hîn jî ji van beşan bermahiyên bihêz hene.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çend şaristaniyên dewleta koledar binivîse.
2- Çawa pişaftina çandî, li ser kurdan hatiye sepandin?
3- Çima pişaftin di çanda kurdan de bi awayekî hêsan û berfirehtir, belav bûye**?**
4- Kengî zimanê erebî, cara pêşî bû zimanê hevpar ê çanda Rojhilata Navîn?
5- Çînên serwer, li ser kîjan bingehê hebûna xwe di dîrokê de berdewam dikin?
6- Çîna jor a kurdên hevkar, zimanê erebî weke nîşana çi dihesibandin?

WANE 4

DI ŞARISTANIYA FEODAL DE KURD

Kurd, di dema civaka dewletî ya koledar de tenê beşek hatiye pişaftin û hatiye rewşa çînayetiyê. Lê di dema civaka dewleta feodal de beşek ji civaka kurdan yekbûnek bi çîna koledar re pêk aniye. Di çêkera dewleta feodal de jî; zayendparêz, çînayetî û cudahiyên olî her ku diçû, bi awayê nakokiyên kûr ên civakî bi rêxistin dibe û parçebûna civakî her ku diçû, dihat kûrkirin.

Civaka kurd, di dewleta koletî de yek ji gelên herî kêm ku reseniya xwe neparastiye. Di dema dewleta koletî de kurdan hin rewşên xwe yên xweser parastine. Lê di derbxwarina tiştên civakî yên weke baweriyê de kurdan ji çalakiyên wê yên cewher, birîneke jidil wergirtine. Di pêvajoya belavbûna xirîstiyaniyê de erdnîgarî û civaka kurdan ji bo hêzên şerker, weke qadeke girîng û baş nirx qezenc kiriye. Bi belavbûna misilmantiyê re jî, baweriya kurdan a resen û çêkera ola wan, li beramberî olên deshilatdar dikevin pêvajoyeke pişaftinê. Ol û baweriyên xwezayî û civakî yên weke; Zerdeştî, Êzîdîtî, Elewîtî û Manîtî li beramberî olên yek xwedayî yên deshilatdar, pişaftina wan a ji cewherê xwe valabûn û ji bo etnîsîteya kurdan jî rûreşiyeke mezin bû.

Her çanda ku tê pişaftin û di heman demê de çanda civakî ya resen ber bi tunebûnê ve biçe, di wateya nasnameya neteweyî de ye. Bi taybetî, qadên rast û deşt bi qasî ku ola îslamiyetê dipejirandin, ew qas ji bawerî û ola xwe dûr diketin. Lê li qadên çiyayî, demeke dirêj li ber xwe didan û ta demekê berxwedanên girîng nîşan dane, yekbûn li gorî ku reseniya xwe winda bike, neçarî pejirandina bawerî û olên din kirine.

Bi olên yekxweda û bi taybetî bi îslamiyetê re çanda kurdan a civaka xwezayî, ketiye nava pêvajoyeke pişaftina kûr. Olên herêmî û xwezayî, li beramberî olên deshilatdar çewisandineke mezin jiyan dikir. Her ola ku winda dibe, encama serdestiya ola deshilatdar e. Bi mercekî mirov ola xwe mandel dike û xwe neçarî pejirandina ola deshilatdar dike.

Îro çawa ku kurd li hemberî nasnamayên neteweyî, bi zorê neçarî mandelkirina nasnameya xwe tên kirin; di dema feodaliyê de jî kurdan neçarî mandelkirina ola xwe ya resen dikirin.

Bi awayekî rast, ev bandor dikeve bin desthilatdariya beg, axa, mezheb û şêxan. Mêtîngerî, wê bi tiştên olî ve kedxwariya herî mezin ên di dema xwe de bi dest bixe. Olên deshilatdar, li şûna ku bangewaziya cîhana giyana mirovan bike, mirovan radestî cîhana bi pirsgirêk û aloziyan dike. Dema ku tê xwestin di nava komên mirovan ên heman baweriyê de yekîtiyeke wekhev û azad hebe, bi navê; zayend, çîn û cudakariya ramyarî û di bin banê heman olê de mêtîngeriyeke kûrtir aniye. Kurd, vê cudakariya kûr û mêtîngeriyê, di bin navê olê de bi hezarê salan jiyan dikin.

Ol çi qas ji bo mêtîngeriyê amûrek e, neteweyên deshilatdar digotin: “Em di heman olê de ne, em birayên hev in, cudahiya me ji hev tune ye.” mafên bingehîn ên herî girîng ên gelê kurd bi sedê salan nas nakin û mêtîngeriyeke mezin bi dest xistine. Ji bawerî û perestina olên wî qut kirin, kurd ji çanda wan a deshilatdar rizgar nebûne. Bi navê misilmantiyê (misilmantiya ramyarî), ji hebûnên xwe yên bingehîn dûr ketin, weke yên ku bawer dikin, xizmet kirine. Ji xwe re deyn, an jî xwe deyndar didîtin.

Misilmantiyê ta parzemînên din jî birine. Bi mal, can, hebûna xwe, welatê xwe, bi navê misilmantiyê xwe cangorî kirine. Ji kesên din re xebat, şerkirin û rizgarkirina dewletê bi

cih anîne. Tevî vê cangoriya wan, ji wan hatiye xwestin xwe mandel bikin. Ji ber ku yên pergalê nepejirînin û li hemberî wê derkevin, weke metirsiya herî mezin didîtin.

Kurdan, di vê pêvajoyê de dîsa li hemberî civaka bidewlet, berxwedaneke mezin nîşan dane. Pişaftineke mezin jiyan kirine, lê çanda xwe ya bingehîn ta mirinê jiyan kirine. Li çiya, gelî, deşt û cihê ku wê bi hêsanî destên deshilatdaran ji wan negirin, dîsa di jiyana wan de sekneke li hemberî pêkanînên wan ku di mejiyê mirovan de maye, heye.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Di dema dewleta feodal de kîjan kiryar li ser civakê dihatin sepandin?
2- Kengî baweriya kurdan a resen û çêkera ola wan, dikevin pêvajoya pişaftinê?
3- Çanda ku tê pişaftin û çanda civakî ya resen dema ku ber bi tunebûnê ve biçe, tê çi wateyê?
4- Encama serdestiya ola deshilatdar a di civakê de diyar bike.
5- Olên deshilatdar, di civakê de pêwîst e çi ji mirovan re bikin?
6- Neteweyên deshilatdar, bi navê olê çi digotin û çi kiryar ji bo mafên kurdan dikirin?
7- Çima ji kurdan hatiye xwestin ku xwe mandel bikin, tevî ku ji kesên din re xebat, şerkirin û rizgarkirina welat bi cih anîne?

WANE 5

DI ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE KURD – 1

Bi belavbûna dema kapîtalîzmê û awagirtina netewe-dewletê re pêvajoya pişaftina li ser çand û zimanê kurdî, dijwartir dibe, tevî ku bandor û zordestiya zimanê erebî, farisî û tirkî jî lê zêde bûye. Dema ku di serdema seretayî û navîn de çand û zimanê kurdî yên di nava etnîsiteyê de hebûna xwe diparast, bi derfetên teknîk û zanistê yên zêde re bûn sê çand û zimanên serdest. Weke çand û zimanên fermî bi bandora xwe re zimanê kurdî baş hatiye pişaftin.

Çand û zimanê kurdî ku di serdema navîn de gelek berhemên wêjeyî yên weke; Ehmedê Xanî, Mem û Zîn derxistiye holê, di bin zexta ramyarî de her ku diçû teng dibû û kurdîtî weke çand û ziman; xistin rewşeke biguman, kirina mijara guneh û gunehkariyê. Ji aliyê burjûwaziyê ve kiryarên herî qirêj û xerab, li ser mirovên kurd bi awayekî pir dijwar, weke; gunehkar dîtin û xistina zîndanan hatine pêkanîn.

Pirsgirêkên ku têkiliya xwe bi rastiya kurdî re hebûn, di beşa gunehên pir metirsîdar de hatine hesibandin. Ji her sê netewe-dewletan (tirk, faris û ereban) ji çand û zimanê dewletê wêdetir, li ser tevahiya hebûna wê; pişaftin, dûrkirin û bi çand û zimanê serdest re girêdaneke bi zor û dijwarî hatiye meşandin. Perwerdehiya bi zimanê dayîkê, kurdî jî tê de li hemû dibistanên neteweya serdest ji yên ku dikarîbûn bixwenda (malbatên dewlemend), kurd û kurdî di her warî de li derveyî nûjeniyê hatine hiştin.

Çapkirina pirtûkan, rojname û muzîka herî hêsan a kurdî hat qedexekirin û di çarçoveya gunehan de hat pejirandin. Wan bi zimanê xwe, weke neteweperestiyeke ku ya Hîtler li paş bihêlin, dikirin.

“Gelê Necîb” navê ereban bû. Tirkîtî, rastiyeke bexteweriyê bû. Farisî, resenbûna herî mezin a dîrokê bû.

Hestên neteweperestiyê yên ku kapîtalîzmê hişyar kirin, bûn xwediyê bandoreke binakokî ku hemû rewşên paşverû li ser kurdan binixumîne.

Lê bi pêngava mezin a globalbûna kapîtalîzmê û pêşketina teknolojiyê (radyo, TV û înternet) re xebatên ku li derveyî welat hatine kirin, bû sedem ku hinekî kurd û kurdîtî cih bibînin û bi ser xwe ve werin. Bêguman, di bingeha vê rastiyê de bandoreke diyarker a têkoşîna hemdem jî hebû. Berxwedana demokratîk a neteweyî, ya ku li hemberî pişaftina ku bi darê zorê afirandine, hatiye meşandin, bû sedem ku çand û zimanê neteweyî yê kurdan ji nû ve derkeve holê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Kengî pişaftina li ser çand û zimanê kurdî dijwar bûye?
2- Çawa çand û zimanê kurdî di dîrokê de hebûna xwe parastine?
3- Çawa çand û zimanê kurdî di serdema navîn de dihatin dîtin ?
4- Pergala burjûwaziyê çi bandor li ser kurdan kiriye?
5- Çend kiryarên netewe-dewletên tirk, faris û ereban ên li ser çand û zimanê kurdan binivîse.
6- Çawa kurd û kurdîtî bi ser xwe ve hatine û careke din derketine holê?

WANE 6

DI ŞARISTANIYA KAPÎTALÎST DE KURD – 2

Gelê kurd, di dîrokê de her çi qas gelê herî kevn û afirîner bû, lê di dîrokê de bi rewşeke domdar qet jiyan nekiriye, di roja me de weke îroniyeke kurdî derdikeve pêşberî me.

Civaka bidewlet a kapîtalîst, ger ji bo gelên din pêvajoyeke xizmetê be, ji bo kurdan pêvajoyeke mirinê ye.

Di pergala dewleta koledar de li ser kurdan civaka çînayetî hatiye sepandin. Civakên kurdan ên weke; Hûrî, Gûtî, Mîtanî jî çêbûne, lê weke tê zanîn tu carî li ser civaka xwe nebûne desthilatdar û weke Asûr, Babil, an jî Romayê nehatine asta împaratoriyekê. Hatiye xwestin ku di civaka feodal de jî kurd ji bawerî, perestin û olên xwe dûr bikevin. Lê di pergala kapîtalîst de hatiye sepandin ku dest ji nasnameya xwe ya neteweyî, ziman, çand û koka xwe berdin.

Ji ber ku kapîtalîzm, ji beriya her tiştî mandelkirina civakan e. Çi tiştê ku çanda hevbeş tîmar dike û her tiştê ku ji civakê re dibe bingeh jî ji bo kapîtalîzmê metirsiyeke mezin e. Kurd jî xwedî hêzeke wiha ne.

Kapîtalîzm bi xwe, pergaleke aboriyê ye. Ne paradîgmayeke ramyarî, ne jî awayekî civakê ye. Ji ber ku kapîtalîzm bi xwe, pere ye. Pere jî, nabe tiştekî ku civakê watedar bike. Çi tiştê ku bi civakê re têkildar e, ji bo kapîtalîzmê dijberiyek e. Kapîtalîzm bi awayekî dîrokî, pêvajoya herî jor a şaristaniyê ye. Çanda şaristaniyê; bi awayekî hiyerarşîk, zayendparêz û sermiyandarî li hemberî civakên xwezayî, çareseriyeke dijberî xwe birexistin kiriye.

Kurdan jî ji ber ku di dîrokê de pergala desthilatdar a heye, nexistine nav xwe, her tim li paş pergalê mane.

Çanda şaristaniya çînî, olî û neteweyî, ji ber ku her tim ji derve ve dihat sepandin, beşeke biçûk ê ji kurdan ku xwe

spartiye, çêbûye. Ev beş, bêvîn û ji hêza koka xwe bêpar in. Bi navê civakîbûnê, sûdeke wan nayê dîtin, risteke xerab û qirêj ji bo hêzên desthilatdar lîstine. Navendên civakî yên weke; serok, eşîr, begên xwedî xak, şêx, terîqet û burjûwaziyên kurd, di tu demê de ji bo welatên xwe, çand û nasnameya xwe sûdmend nebûne û nebûne xwediyê berpirsiyariya welatê xwe.

Pergala ku vê li ser van beşên kurdan disepîne, pergala kapîtalîzmê ya bi rêxistinkirî û netewe-dewlet e. Di civaka kurdan de bi cewherê civaka xwezeyî ve girêdayî çanda hevbeş a jiyanê çi hebe, kapîtalîzm bi netewe-dewletê re wê bêwate dike, dihelîne û hewl dide bi tevahî tune bike. Bi gotina; "Kurdê herî baş, ê xwe mandel dike ye" polîtîkaya netewe-dewlet a li ser kurdan, polîtîkaya serdema nûjentiyê ya herî stratejîk pêk tîne.

Çima ji bo kurdan ev polîtîka hatiye dîtin û pêşxistin? Gelek sedem tên nîşandan. Lê sedemên herî diyar; erdnîgariya Kurdistanê, gelê kurd, bûna xwedî dîrok û şaristaniya herî kevn e, ku ji çanda berxwedanê re piştgirî û malovanî kirine. Pergal jî, wê her tim dijminatiya kurdan bike, tune û mandel bike. Ji beriya demekê negihîştina kurdan a dewleteke neteweyî, weke bi kêrnehatin û paşverûtiya wan dihat şîrovekirin. Lê ta niha, berovajî pêkhatineke wisa nedihat hizirîn. Lê di demên dawî de wisa derdikeve holê ku sedema nebûna dewletê, kêmasî û şaşitiyek e, ne weke çandek sincî jî dihat nirxandin.

Tevahiya nasnameyên civakî yên ku jiyan dikin, bi awayekî xwezayî wê li dijî pergala kapîtalîst û deshilatdariya netewe-dewletê derkevin.

Kurd ji bo dewletbûnê, hema bêje li dijî hemû pergalan berxwedanî kirine û her tim weke gelê xwedî maf mane.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çawa gelê kurd di dîrokê de dihat xuyakirin?

2- Civaka bidewlet a kapîtalîst, ji bo kurdan tê çi wateyê?

3- Civaka feodal û pergala kapîtalîst, çi kiryar li ser kurdan sepandine?

4- Kapîtalîzm, bi awayekî dîrokî tê çi wateyê?

5- Li gorî pergala kapîtalîzmê, kurdê baş kî ye?

6- Çima li ser kurdan, polîtîkaya serdema nûjentiyê hatiye dîtin û pêşxisitn?

7- Çima pergala kapîtalîzmê, her tim dijminatiya kurdan dike?

WANE 7

ÇANDA BERXWEDAN Û XIYANETÊ

Li hemberî her pergala deshilatdar, kurdan helwesteke dijber afirandiye. Bi qasî ku kariye, li gorî hêza xwe şer kiriye, têkoşîn daye û ji bo ku bi wê ve nebe, ji wê dûr rawestiyaye. Kurdan bi hêsanî tiştên ku neyên wan û ne ji cewherê wan bin, tu carî nepejirandine.

Dijmin, li hemberî vê kevneşopiya berxwedanê ya azadîxwaz, hewl dane ku kurdan ji hundir ve bişikînin û bingeha azadiya wan bêwate bikin. Daxwaza azadiyê ya kurdan; ji Hûriyan, ta Gûtî û Medan weke civak li hemberî pergala desthilatdar risteke girîng lîstine. Ji aliyê Hûrî û Medan ve li hemberî sitemkariya Asûr û Babil, ji bo gelên ku tên perçiqandin, risteke pêşengî ya dîrokî lîstine. Lê di civaka feodal û kapîtalîzmê de bi taybetî, çîna jor a kurdan ji azadî û berxwedanê zêdetir, radestbûn pejirandine. Bi vî awayî, cudakariya çînî ya di civakê de pêk tê. Lê cudahiyeke wisa çêdibe ku civaka jor a kurdan; tu carî ji bo welat, xak û civaka xwe nebûne xwedî çandeke ku li xwe xwedî derkevin. Bi vî awayî, yekîtiya civakî, zoriyeke jidil jiyan kiriye. Her çi qas derfetên hevgirtina yekîtiyeke hevbeş a di navbera hêzên civakî û di nava gel de çêbibe, bingeha mercên civakî ji aliyê van hêzan ve her tim hewla xerabkirina wan hatiye dîtin.

Çînên desthilatdar ên kurdan, ji bo berjewendiyên xwe yên civakî, çînî, keda civakî û ya ji bo welat, bêrûmet kirine û xwe ji dijmin re pêşkêş kirine. Di dîrokê de deshilatdarên kurdan ên di dema Hûrî, Gûtî û Medan de li hemberî dewletên koledar, hewldanên wan ên ji bo azadiyê her tim çêbûne. Li hemberî dewleta rahîb a Sumeran, ji bo azadiya xwe şer kirine. Desthilatdarên Medan, li hemberî sitemkariya Asûr bi sedê salan bi gel re di heman çeperan de şer kirine. Lê deshilatdarên

kurdan, rista koletî û bêrûmetiyê lîstine. Li şûna ku bi dijminên xwe re şer bikin, bi erka sîxurî, nokerî û hevkariyê re gelê xwe perçiqandin û bûne rêberê ramyariya mendel û tunekirina xwe û gelê xwe jî. Xwe anîn rewşeke şermkirinê ku êdî qala çand, ziman û nasnameya xwe nekin. Bi taybetî, di pergala kapîtalîzmê ya hemdem de ji hevkariyê wêdetir, li ser bingeha ku gelê kurd bi giştî tune bikin, xwe jî biçûk xistin.

Dîroka kurdan, bi qasî ku dîroka berxwedan û azadiyê ye, di heman demê de dîrokeke têr xiyanete jî. Ev jî çandek e. Ev çand, divê baş û di cih de were xwendin û naskirin. Ev çîna deshilatdar, tevahiya gelê kurd ji bo berjewendiyên xwe firotine dijmin û firotineke wiha ji xwe re kirine pîşe. Civak çi qas pêş dikeve, bi awayekî xwezayî statuyên civakî jî neçar in werin guhertin. Lê ev guhertin di kurdan de weke guherîneke xwezayî pêk nehatiye. Saziyên olî û serokê olan, tu carî li perestin, bawerî û toreyên civakî xwedî derneketine. Rewşenbîrên kurd û yên xwe rewşenbîr didîtin, tu carî berpirsiyariya ronîbûnê û pêşengtiyê şanaz nehatine dîtin.

Gelek nirxên ku kurdan winda kirine, hene. Nasname, çand û ta hatin rewşa ku zimanê xwe jî winda bikin. Nasname, çand û ziman; kes û civak bi xwe ye.

Kurdan, bi awayekî azad xwe îfade kirine û çêkera çînî zêde pêk neanîne. Nebûne dewlet, lê her tim xwestine ku bibin civakeke azad. Ji bo azadiyê, her tim bi mirinê re rû bi rû mane. Ji bo azadiyê jî, pêwîstî bi çanda berxwedanê heye.

Çanda berxwedanê, di nava kurdan bi xwe de jî, baş tênegihîştine û dernexistine zanabûnê.

Ji aliyê hest, hezkirin û giyanî ve ne di girîngiya çanda berxwêdanê de ne. Bêguman, ev zanîneke li gorî dem û pêvajoyê ye, ne zanabûneke rêxistinkirî ye. Ji ber vê yekê, zêde encam jî nagire. Di encama her berxwedanê de hin kurd ji aliyê vînê ve dişikin, moralên wan dikeve û her ku diçe qada xiyanetê

berfireh dibe. Çanda berxwedanê, ji beriya her tiştî, li hemberî xiyanetê seknek nîşan daye. Her nêzîkatî û sekna ku azadiyê sînordar dike û mirov bêvîn dike, nêzîkatiyeke xiyanetê ye.

Çîna hevkar, nirxên gel bêwate dike. Gel jî beriya ku li dijberî dijmin raweste, li hemberî hundir û xiyanetê seknekê nîşan dide. Sedema ku li hemberî nêzîkatiyeke wiha sekneke rûmetdar tê nîşandan, ji ber ku xiyanet, di çanda berxwedêr de rista lewazbûnê dilîze û daxwaza gel a ji bo azadiyê lewaz dike.

Di sedsala dawî de kurd ketin pêvajoya xwe ya dîrokî ku herî girîng û metirsîdar e. Dijmin êdî dixwaze di nava netewe-dewletê de bi awayekî xurt pêvajoya pişaftinê li ser kurdan bisepîne, da ku nasnameya kurdan jî winda bike. Ji bo rawestandina vê pişaftinê, kurdan bi saya pêşengên xwe yên leşkerî (YPG, YPJ û QSD’ê), ramyarî û civakî yên ku berxwedanên mezin digirin li ser milên xwe, bi rê ve dibin. Di heman demê de rewşa xiyanet û xwespartina deshilatdaran jî di lêpirsînekê re derbas dikin. Dema ku vê têkoşînê dimeşînin jî, bi navê gelan û azadiyê; rêzdariyeke mezin çêdikin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Li hemberî her pergala deshilatdar, kurdan helwesteke çawa afirandiye?

2- Daxwaza azadiyê ya kurdan, di dîrokê de li hemberî pergala desthilatdar risteke çawa lîstiye?

3- Çîna jor a kurdan, di civaka feodal û kapîtalîzmê de çi helwest diyar kiriye?

4- Çînên desthilatdar ên kurdan, ji bo berjewendiyên xwe çi kiryar kirine?

5- Nirxên ku kurdan di dîrokê de ji ber xiyanetê winda kirine, binivîse.

6- Çanda berxwedanê ya di nava kurdan de şîrove bike.

WANE 8

ÇANDA NETEWEYA DEMOKRATÎK – 1

Netewe, civak bi xwe ye. Têgeha netewe, dîrokî ye. Weke pir caran tê gotin, ne diyardeyeke ku bi pergala kapîtalîzmê re derketiye holê.

Netewe, weke têgeh; şêweyê civakê yê klan, qebîle û eşîrên xizim e, ku piştî wê şêweyê qewm, gel, an jî milet tê û xwe herî zêde li ser wekheviya ziman û çandê bi rêk û pêk dike. Ji ber vê yekê, civakên neteweyî, li gorî civakên qebîle û eşîran bêhtir xwedî awayekî berfireh in û cudahiyan digirin nava xwe. Ji ber vê yekê, ji komên mirovan ên ku bi têkiliyên sist bi hev ve girêdayîne, pêk tên.

Civaka neteweyî, zêdetir diyardeyeke serdema me ye. Eger mirov wê bi awayekî giştî bide naskirin, mirov dikare bêje; ew koma ku kesên wê xwedî hişmendiyeke hevpar in. Ango, diyardeyeke ku bi awayekî hişî(zihnî) heye. Ji ber vê yekê, civaka neteweyî hebûneke aşopî ye. Tevî cudahiya çîn, zayend, reng, etnîsîte û ta koka cuda ya neteweyî jî, kengî bi awayekî giştî cîhana çand û hişmendiyeke hevpar pêk hat, ev yek ji bo netewebûnê bi nirx dibe. Ji bo ku vê danasîna giştî ya neteweyê bêhtir dijwar bikin, têgehên weke; neteweya dewletê, neteweya hiqûq, neteweya aborî û neteweya leşkeriyê(artêş-netewe) çêdikin û ev bêhtir neteweperestok in.

Mirov dikare ji van re bêje; neteweya hêz û zorê jî. Yek ji armancên bingehîn ên nûjentiya kapîtalîst, pêkanîna neteweya bihêz e. Ji ber ku neteweya bihêz, di warê sermiyanê de dibe xwedî armanc, bazara berfireh, derfetên mêtîngerî û emperyalîzmê.

Divê mirov van neteweyên bihêzkirî, weke modela bi tenê ya netewe nebîne, ta divê mirov wan weke neteweyên şoven ên bihêz û neteweyên di xizmeta sermiyanê de bibîne. Jixwe, ji ber van rewiştên xwe, çavkaniya pirsgirêkan in.

Neteweya demokratîk, neteweya ku herî zêde nêzî wekhevî û azadiyê ye. Li gorî vê danasînê, ji bo civakên ku pêwistiya wan bi azadî û wekheviyê heye, ev têgihîştina netewe ya herî di cih de ye.

Demokrasî, demo; di wateya teng de ji bo gel dihat bikaranîn, mirovên azad in. Krasî; di wateya rêveberiya xwe bi xwe de dihat bikaranîn. Wê demê demokrasî, di wateya berfireh de birêvebirina civakê xwe bi xwe ye.

Neteweya demokratîk, tê wateya li ser nasnameyekê xwebirêvebirina civaka xwe.

Di dewleta neteweyê de hemû nirx û xebata rêvebirinê, di destê çîna serdest de ne. Çêkera neteweya demokratîk, di xebata rêveberî û nirxên civakî de tevlîbûna hemû beşên civakî bingeh digire. Neteweya demokratîk, weke di dewleta netewe de yek ol, yek çîn, yek nasname, yan jî yek desthilatdariyê ranagire.

Nûjentiya kapîtalîst, li ser têgeh û rewişta neteweya demokratîk ranaweste. Ev jî, ji ber şêweyê wê yê avabûn û hegemonyaya wê ya bîrdozî ye.

Neteweya demokratîk, tenê baweriya xwe bi hevpariya hişmendî û çandê nayîne. Tevahî endamên xwe li saziyên xweser ên demokratîk digihîne hev û bi rê ve dibe. Ev, rewişta wê ya diyarker e. Şêwaza rêveberiya demokratîk û xweser, ji bo netewebûna demokratîk, şertê pêşî ye. Bi vî aliyê xwe ve vebijarka(bedîla) dewleta netewe ye.

Li şûna rêveberiya dewletê, rêveberiya demokratîk; derfetekî mezin ê azadî û wekheviyê ye. Civaknasiya lîberal, neteweyê yan bi dewleteke ava bûye, yan jî bi tevgerekê ku

armanca wê avakirina dewletê ye re, wekhev dibîne. Sosyalîzma pêkhatî jî, xwedî lêgereke bi vî awayî bû û ev jî, hêza bîrdoziya lîberal nîşan dide.

Aboriya ji yekdestiyê rizgar bûye, ekolojiya bi hawîrdorê re lihevkirî, teknolojiya dostê xweza û mirov; bingehên sazîbûna nûjentiya demokratîk in, ango bingehên sazîbûna neteweya demokratîk in.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Neteweyê pênase bike.

2- Çima civaka neteweyî, hebûneke aşopî ye?

3- Çend neteweperestokên ku hatine diyarkirin, binivîse.

4- Çima yek ji armancên bingehîn ên nûjentiya kapîtalîst, pêkanîna neteweya bihêz e?

5- Çima nûjentiya kapîtalîst li ser têgeh û rewişta neteweya demokratîk, ranaweste?

6- Neteweya demokratîk, li ser kîjan baweriyê civakê bi rê ve dibe?

7- Bingehên sazîbûna nûjentiya demokratîk, diyar bike.

WANE 9

ÇANDA NETEWEYA DEMOKRATÎK – 2

Neteweya demokratîk, modeleke neteweyê ye ku herî kêm nexweşiyên weke; ‘yek al’, ‘yek ziman’, ‘yek gel’, ‘yek ol’, ‘dewleta navendî’ û dirûşmeyên wê yên sereke ku guhên mirovan ker dikin, li cem wê hene. Rêveberiya xwe pîroz nake. Rêveberî, weke diyardeyeke zelal di xizmeta jiyana rojane de ye. Dema ku pêdiviyên wê bi cih bên anîn, her kes dikare weke karmendek bibe rêveber. Rêvebertî; bi nirx e, lê pîroztî tê de tune ye. Têgihîştina nasnameya neteweyê vekiriye; bawerî û endamtiyeke olî ya sergirtî tune ye. Mirov ji neteweyekî be, ev jî ne şerm û kêmasiyek e. Mirov dikare bibe endamê ji yekê zêdetir neteweyan. A rastî, dikare gelek neteweyên cuda bikevin nava hev.

Eger neteweya demokratîk, bi neteweya hiqûqê re li hev bike; bi hêsanî dikarin bi hev re bijîn. Tevî ku welat, al û ziman hêja ne jî, lê ne pîroz in. Welat, ziman û alên hevpar dikarin di nava hev de li şûna dijberiyê li ser bingeha dostaniyê bi hev re bin. Diyardeya neteweya demokratîk; bi van taybetmendiyên xwe ve hemûyan weke vebijarka bihêz li şûna netewe-dewletê ya ku bûye amûreke şer di destê nûjentiya kapîtalîst de bi cih dike.

Neteweya demokratîk; weke modeleke çareserker, têkiliyên civakî yên neteweperestiya dewletê û parçe kirine, ji nû ve demokratîk dike. Li hev tîne, aştiyane û bêhnfireh dike. Kengî dewleta netewe ber bi neteweya demokratîk ve biçe, ev yek wê bi xwe re destkeftiyên gelekî mezin bîne. Modela neteweya demokratîk; beriya her tiştî, têgihîştinên civakî yên ku bi tundiyê bar kirîne, bi têkiliyeke rast a civakî ya nerm û mirovane disepîne, ango mirov bi aqil û hestiyar dike, wî dike mirovek xwedî empatî û xweşbîn.

Bêguman, têkiliyên mêtinkarî û tundiyê dadiwerivîne. Navê wan bi tevahî ji holê raneke jî, lê dikare têra xwe wan kêm bike, bi pêkanîna derfetên ji bo civakeke azadtir û wekhevtir vê

bi cih tîne. Tenê ji bo nav xwe; xweşbînî û aştiyê pêk nayîne di heman demê de li dijî neteweyên din ên li derve, ku bi nêzîkatiyên zordestî û mêtinkariyê ve barkirîne, vediguherîne berjewendiyên hevpar û bi vî awayî, vê erka xwe pêk tîne.

Kengî saziyên neteweyî û navneteweyî, li gorî têgihîştina bingehîn a sazîbûn û hişmendiya neteweya demokratîk ji nû ve hatin avakirin, wê baş were têgihîştin ku nûjentiyeke nû, ango nûjentiya demokratîk, ne bi teorîk bi encamên pêkanînê jî bi qasî ronesansekê ye. Vebijarka nûjentiya kapîtalîst, nûjentiya demokratîk û neteweya demokratîk a ku di bingeha wê de civakeke aborî, ekolojîk û aştiyane heye.

Di roja me ya îro de riya rast a ramyarî û sincî ya ku em ji qeyrana kapîtalîzmê ya darayî(fînansê) rizgar bibin, divê neteweyên demokratîk ên nû yên pirsgirêkan çareser dikin, bên avakirin û li şûna dewleta neteweyî ya ku nava wê vala, yan jî hatiye valakirin û yekîtiyên wê yên herêmî û global, bi taybetî, neteweyên yekbûyî, divê neteweyên demokratîk ên ku xwedî rewiştên demokratîk bên avakirin, an jî weke yekîtiya Ewrûpayê ya ku nêzî vê pergalê ye, were pêşxistin

Ji bo kurdan girîngiya netewebûna demokratîk

Kurd; di Rojhilata Navîn de di bin zextên bîrdozî yên neteweperestiya dewletê û şovenîzmê de mane.

Gelê kurd, ji neteweperestiya ereb, fars û tirk pir êş kişandiye. Ji ber zexta dewletên neteweperest ên ku li dijî demokrasiyê ne, di nava tevgera gelê kurd de jî bi awayekî xwezayî, neteweparêzî pêş ketiye. Lê belê di nava çavkaniya pirsgirêkên Rojhilata Navîn de hatiye pejirandin ku neteweperestî ji bo pirsgirêkan, nabe çareserî. Ev rewş, bûye sedem ku tevgera gelê kurd ber bi lêgerên bîrdoziyê ve biçe.

Di cihekî weke Rojhilata Navîn de ji ber şert û mercên ku kurd di nav de ne, Birêz Abdulah Ocalan di encama lêgera bîrdoziyê de têgeha feraseta neteweyî ya nû ku pêş xistiye, neteweya demokratîk e. Feraseta neteweya demokratîk, ji bo tevgera kurd a veguhertina dewletan, dibe çavkanî û amûra bîrdoziyê ya herî girîng. Têgeha demokratîkbûna neteweyê, di Rojhilata Navîn de li hemberî dewletên neteweperest û şoven, çareseriya herî bi bandor e.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Modela neteweya demokratîk, çawa tê dîtin? Şirove bike.

2- Çawa modela neteweya demokratîk, dikare mirov bike mirovek xwedî empatî û xweşbîn?

3- Têkiliyên mêtinkarî û tundiyê, di neteweya demokratîk de çawa tê dîtin?

4- Vebijarka nûjentiya kapîtalîst, çi ye?

5- Di roja me ya îro de em ê çawa ji qeyrana kapîtalîzmê ya fînansê rizgar bibin?

WANE 10

RÊGEZÊN NETEWEYA DEMOKRATÎK

1- Di neteweya demokratîk de mirov:

Divê mirovên welat bi qasî ku azad bin, komînal jî bin. Li hemberî vê, mirov azadiya xwe di komînên civakê de dibîne, ango di civakên biçûk ên bêhtir kêrhatî de dibîne. Kom, an jî komîna demokratîk û azad, dibistana bingehîn e ku mirovên azad lê çêdibin. Gelek cureyên komînan hene û di her qada jiyanê de çêdibin. Li gorî cudahiyan, mirov ji komînekê zêdetir, dikare di nava komînan de cih bigire. Ya girîng ew e, ku mirov li gorî hêz û zanabûna xwe, li gorî ked û cudahiyên xwe zanibe di nava komînan de cih bigire.

2- Jiyana polîtîk û xweseriya demokratîk:

Mirov weke têgeh, di avakirina neteweya demokratîk de dikare alî û şaxên polîtîk weke xweseriya demokratîk bide. Mirov bêyî xwebirêvebirinê, nikare bi neteweya demokratîk bihizire. Bi giştî şêweyên neteweyan, bi taybetî jî neteweyên demokratîk, hebûnên civakî yên xwedî rêveberiyên xwe ne. Eger civakek, ji rêveberiya xwe bêpar be, ew ji netewebûnê derdikeve. Di rastiyên civakî yên hemdem de mirov nikare neteweyan bêyî rêveberî bihizire. Ta neteweyên mêtingeh, her çi qasî ji biyaniyan pêk bên jî, rêveberiyeke wan heye.

3- Neteweya demokratîk û jiyana civakî:

Civaka alternatîf a ku li dijî civakeke windayî û jibîrkirî, li dijî civaka desthilatdarî û dewletê, yan jî li dijî bêcivakbûnê ye; civaka demokratîk e.

Li dijî qedandina civakê ya ku her şêweyê kolekirin û newekheviyê pêk tê û pê didin pejirandin, civaka ku gihîştiye hebûna azadî û wekheviyê ye. Dema ku mirov ji aliyê jiyana civakî ve neteweya demokratîk binirxîne; bi hêsanî mirov digihêje van pênaseyan. Ji bo jiyaneke tekûz û durist, yek ji şertê sereke ew e, divê civakîbûna neteweya demokratîk pêk were û civaka ku dewleta netewe ew qels kiriye, ji nû ve bi ser koka ve were.

Civaka bitenduristî, mirovên bitendurist digihîne. Mirov digihêje tenduristiya xwe ya hişî û derûnî, ku li hemberî nexweşiyên fizîkî jî berxwedana wî/wê bi hêz dibe û nexweşî kêm dibin.

4- Di neteweya demokratîk de hevjiyana azad:

Divê mirov dev ji hişmendiya xwemaliya jinê berde. Divê jin bi awayekî serbixwe be û kes ne xwediyê wê be. Xwediyê wê; ew bi xwe ye. Divê girêdanên hestyarî û evîna çavsorî nebe, berovajî vê jî rast e. Di heman demê de divê jin jî, xwe bi kesî ve girê nede û kesî neke xwediyê xwe. Divê nêzîkatiya zilam a ji jinê re ku hevjiyan bikin, li ser bingeha avakirina civakeke sincî û demokratîk be. Ji ber vê yekê, bi vê kesayeta xwe ya azadbûyî, em dikarin dest bi avakirina neteweya demokratîk û civaka nû bikin.

5- Di neteweya demokratîk de aborî:

Di civakê de dagirkeriya aboriyê; rêbaza dagirkeriyê ya herî dijwar, hilweşîner û jihevxistinê ya herî hovane ye. Pergala aboriya neteweya demokratîk; tenê van pêkanînên hov ranawestîne, ji nû ve rista civakê ya li ser aboriyê pêk tîne. Di navbera dewleta netewe û neteweya demokratîk de bi kêmanî li ser xweseriya aboriyê lihevkirin çêdibe. Divê mirov aboriya komîn a xweseriya aboriyê, bi kapîtalîzma dewletê û aboriya wê re tevlîhev neke. Em qala yekîneyên aboriyê dikin ku herî zêde bi xwezaya mirov û hawîrdorê re li hev in. Di komînê de cihê karên dijwar û karê ku azadî pêk neyê, tune ye.

6- Çêkera hiqûqî ya neteweya demokratîk:

Çêkera hiqûqî, xwe dispêre cur bi cur û cihêrengiyê. Ji ber vê yekê, neteweya demokratîk li hemberî hiqûqê, bi taybetî li hemberî destûra hiqûqî, hestiyar e. Neteweya demokratîk, ji neteweya hiqûqê bêhtir sincî û polîtîk e.

7- Çanda neteweya demokratîk:

Ev çand, xwe dispêre dîrok û çanda gelan û kedkaran û deriyê wê ji bo hemû gelan, ji yekîtî û hevgirtinê re vekiriye.

8- Pergala xweparastinê ya neteweya demokratîk:

Ev pergala xweparastinê, wê di her qadê de berpirsiyar be. Wê bi awayekî hêjayî serweriya neteweya demokratîk ava bike. Li dijî hemû kiryarên; şerên leşkerî, polîtîk, çandî, civakî û derûnî yên dewleta netewe

yên ku gihîştine asta qirkirina çandî, bi domdarî derdikeve. Hebûn û azadiya kurd, her wiha hemû gelên din ku bi hev re dijîn, bêyî xweparastinê nabe.

9- Dîplomasiya neteweya demokratîk:

Bi kevneşopiya neteweya demokratîk re wê dîplomasî bibe amûra danûstendineke afirîner û di navbera civakan de wê bibe amûra piştgirî û aştiyê. Bi awayekî bingehîn, wê bi çareserkirina pirsgirêkan re mijûl bibe. Ne amûra şeran a weke di navbera dewletên neteweyî de ye. Erka bingehîn a dîplomasiyê, erka xwe ya sincî û ramyarî ku mirovên zanyar pê radibin, diyar dike.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Çawa mirov di neteweya demokratîk de azad dibe?

2- Eger civakek ji rêveberiya xwe bêpar be, tê çi wateyê?

3- Civaka demokratîk, li hemberî kîjan civakê derketiye holê?

4- Nêzîkatiya zilam a ji jinê re ku hevjiyan bikin, divê çawa be?

5- Di civakê de dagirkeriya aboriyê tê çi wateyê?

6- Çanda neteweya demokratîk, şîrove bike.

7- Pergala xweparastinê, li dijî kîjan kiryaran derdikeve?

8- Erka dîplomasiya neteweya demokratîk, diyar bike.

BEŞA 4

TOLHILDANA ÇANDÊ YA JI NETEWE-DEWLETÊ

1- TEVGERA ETNÎSÎTE Û NETEWEYA DEMOKRATÎK

2- ZÎNDÎBÛNA KEVNEŞOPIYA OLAN; TEVGERÊN OLÎ Û ÇANDÎ

3- TEVGERÊN XWESER ÊN BAJAR, NAVÇE Û HERÊMAN

4- ERKÊN REWŞENBÎRIYÊ

5- ERKÊN SINCÎ

6- ERKÊN POLÎTÎKAYÊ

WANE 1

TEVGERA ETNÎSÎTE Û NETEWEYA DEMOKRATÎK

Di serê tevgerên çandî de ku netewe dewletê nekariye wan biçewisîne û tam bihelîne, neteweperestiya herî biçûk a diyardeyên etnîkî ye. Ev diyardeyên etnîkî, ji neteweperestiya netewe dewletê cuda ye. Naveroka wê, bi piranî demokratî ye.

Armanca wê ya herî bingehîn, ew e ku ji gerîna li dewleteke nû zêdetir, karibin li derdora çandên xwe bibin pêkhateyeke ramyarî ya demokratîk. Ev yek, ji xweseriya herêm, yan jî navçeyê cuda ye. Divê yêkîtî û hevgirtin; ji hemû pêkhateyên ku heman hebûna çandî parve bikin û ji derveyî sînoran jî bin. Her wiha, yek ji armanca wê ya girîng jî, ew e ku heyîna xwe li hemberî etnîsîteya desthilatdar biparêze.

Di wateya giştî de ji tevgera ku ji tevgerên bindestan ên weke; etnîsîte, gel, netewe û hwd. gaveke pêşdetir in, mirov dikare ji wan re bêje; **tevgera neteweya demokratîk**. "Weke etnîsîte, bi tena serê xwe li ser piyan mayîn û jiyana xwe berdewamkirin, gelekî zor e". Lê gelek çand û etnîsîteyên cuda di nava cudahiyên cur bi cur de dikarin di nava yêkîtiyekê de bi hev du re jiyan bikin.

Di roja me ya îro de împaratoriyên berê, yan jî monarşiyên ku em bi nav dikin, di wê demê de jî her netewe, etnîsîte û qewm bi çand, reng û xweseriya xwe ya demokratîk, jiyan dikirin. Di sedsala me ya îro de jî di nava gelek dewletan de gelek etnîsîte û netewe bi awayekî xweser jiyan dikin. Hin bi navê federal, konferedal, an jî yekîtiyeke ku li ser bingeha "di nava cudahiyan de yekbûnê" jiyan dikin. Lê nûjentiya netewe-dewletê, ev pergal hilweşandiye û bi vê hişmendiya xwe ve ber bi faşîzmê ve diçe ku di encama wê de pişaftin û qirkirin li ser etnîsîteyan çêbibe.

Ravekirin û şîrovekirina li ser bingeha ku etnîsîte û gelên bindest dixwazin bibin netewe, yan jî dewleta neteweyî, karesat û bangeşeyên lîberalîzm û sosyalîzma pêkhatî ne.

Ev rewş, encama neteweperestiya faşîzm û totalîtarîzmê ye. Lê belê avakirina neteweya xwezayî, li ser bingeha çandîbûnê li gorî rêgezên rêveberiya demokratîk, riya rast, mirovane û destdayî xwezaya civakî ye.

Dema ku dewleta neteweyî, ji civakê re bû pirsgirêk (şerên herêmî û cîhanî, pirsgirêkên neteweperestiyê û kapîtalîzmê), rewşa derketina neteweya demokratîk, weke rê û çareseriyeke xwezayî pêwîst e pêk were.

Dema ku tevlîheviya netewe dewletê derket holê, têkoşîna neteweya demokratîk zêdetir bû. Ev rewş, bi Şerê Cîhanê yê Duyem re pêşiya wê zêdetir vebû. Neteweya demokratîk; têgeheke pir çandî û pir rengî ye. Aborî, civakî, ramyarî, hişmendî, ziman, ol û etnîsîteyên cuda, xwe bi navê neteweya demokratîk bi nav dikin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Naverok û armanca tevgerên etnîsîteyê diyar bike.

2- Tevgera neteweya demokratîk, pênase bike.

3- Riya rast, mirovane û hêjayî xwezaya civakê, kîjan e?

4- Neteweya demokratîk; weke têgeh tê çi wateyê?

5- Kengî têkoşîna neteweya demokratîk, zêdetir bûye?

WANE 2

ZÎNDÎBÛNA KEVNEŞOPIYA OLAN; TEVGERÊN OLÎ Û ÇANDÎ

Tê çavdêrîkirin ku kevneşopiya olî ya ku nûjentî û bi taybetî jî netewe dewlet, hewl didin wê bi têgeha laîkperestiyê re dagir bikin, hem bi hêmanên xwe yên radîkal, hem jî bi baskên xwe yên nerm ve derketine holê.

Laîktî, têgeheke ne diyar e. Her çi qas ku wê weke destvekişandina tam a olê ji jiyana cîhanî û bi taybetî ji karûbarên dewletê pênase kiribin, laîktî weke tê gotin; ne tam cîhanî ye, ne jî ol tam dikare ji dewletê were razberkirin. A girîngtir jî ew e ku ol, di rastiyê de erkên cîhanî û civakî; bi taybetî jî erkên dewlet û desthilatdariyê bi rêk û pêk dikin

Laîktî, rêbazeke Masonîk e, ku ji aliyê avanîsaziyên cihû ve di serdema navîn de hatiye pêşxistin. Ji bo şikandina serweriya cîhana katolîk e. Laîk, ku bi şoreşên burjûwaziyên Holanda û Îngilîz ve gav avêtin, ji şoreşa Fransayê qezencên pir mezintir bi dest xistine. Bi avakirina netewe dewletê re xwe birêxistin kirine, weke beşeke ku bingeha dewletê be, ya ku xwegihandina wê, nasîna wê û xistina wê ya ji desthilatdariyê herî zor e.

Vê serweriya xwe, ji wê demê ta roja me ya îro didomîne. Ew diyardeya ku netewe dewletan di nava xwe de veşartiye, vê rastiyê rave dike. Her netewe dewletek, ku hejmara wan li cîhanê di roja îro de du sedî derbas dike, çawa ku laîk e, ew qas jî Masonîk e. Masonîk, hêza bingehîn a serweriya bîrdoziyê ya nûjentiya kapîtalîst e û bandora wê jî cîhanî ye.

Ev, cihê xwe hîn jî xurt dike û didomîne. Navendên din ku di wan de bi bandor e, gelek saziyên civaka sivîl, di serî de yekdestên medya û mamosteyên zanîngehan in, ku di rêveçûna

stratejîk a cîhanê de xwedî risteke girîng in. Di cihê venêr û aqilmendên nûjentiyê de ne, ku jê re dibêjin; Cîhana laîk.

Her ku îslam û kevneşopiyên din ên olî di serî de katolîktî, bi bandora nûjentiyê bên hilweşandin, laîktî; weke bîrdozî û bernameyeke ramyarî, girîngiya xwe winda dike. Ji nû ve zindîbûna ola kevneşopî û bi taybetî gotûbêjên li ser laîktî û ol, di civakên ku bandora kevneşopiya îslamî hîn jî bi awayekî xurt dijîn de geş dibin.

Têkoşîna, weke di navbera xirîstiyanî û mûsawîtiyê de êdî bûye di navbera cîhana îslam û mûsawîtiyê de. Di bin pevçûnên mezin ên li Rojhilata Navîn de ev rastî hene. Tê xwestin ku lihevhatineke mûsawî-îslam a weke li Ewrûpa û Emerîkayê pêk were. Dema ku hêmanên radîkal; dijberî vê lihevhatinê ne, hêmanên nerm; bêhtir nêzî lihevhatinê ne. Lê dîsa jî girîng e ku zindîbûna çanda kevneşopiya olî, bi tevahî weke têgeheke paşverûtiyê neyê dîtin. Di rêjeya ku serî li hemberî nûjentî û dewleta neteweyî rakin (serhildan) de naveroka demokratîk di nava xwe de werdigire.

Çawa ku gengaz e pirsgirêkên çandên cuda yên etnîkî, di çarçoveya neteweya demokratîk de bên çareserkirin, divê naveroka demokratîk a çanda olî jî, weke yek ji hêmanên wekhev, azad û demokratîk di nava neteweya demokratîk de were nirxandin û di çareseriyê de cih jê re bê dayîn.

Di wateya sincî de jî çawa ku etnîsîte û neteweyên cuda di çêkereke demokratîk de dikarin li gel hev jiyan bikin; çêkera olên cuda jî, bi gelek cudahiyên xwe ve bi şêweyekî demokratîk dikarin li gel hev jiyan bikin.

Hevpeymana ku li dijî nûjentiya sermiyandarî pêş ketiye, olên çandî jî dikarin di nava vê hevpeymanê de cihên xwe bigirin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Laîktiyê, pênase bike û armanca wê diyar bike.

2- Masontiyê, pênase bike.

3- Cîhana laîk, pênase bike.

4- Kengî laîktî, weke bîrdozî û bernameyeke ramyarî, girîngiya xwe winda dike?

5- Çima divê zindîbûna çanda kevneşopiya olî, bi tevahî weke têgeheke paşverûtiyê neyê dîtin?

6- Girîngiya zîndîbûna kevneşopiya olan, diyar bike.

WANE 3

TEVGERÊN XWESER ÊN BAJAR, NAVÇE Û HERÊMAN

Rêveberiyên xweser ên bajar, navçe û herêman, her tim giraniya wan a mezin di dîrokê de heye. Di nava kevneşopiyên çandî yên pir girîng de ne, ku dewletperestiya neteweyê ew kirine qurban. Xweserî û rêveberiyên xweser ên bajar, navçe û herêman di hemû rêveberiyên civak û dewletê de her hene û hatine sepandin. Navendîperestiya çors, weke rewişteke yekdestperest ê nûjentiyê û di bingeh de nexweşiyeke netewe dewletê ya ku weke pêdiviyeke zagona qezenckirina herî zêde hatiye sepandin. Her wiha, ji bo ku burokratên burjûwazî bibin desthilatdar hatiye rêkûpêkirin û weke nimûneyekê ku tenê bi faşîzmê re bimeşe, ji bo ku ne pergaleke qraltiyê, lê bi hezarê pergalên qraltiyê werin sazkirin.

Ji tevgerên xweser ên bajar, navçe û herêman tê xwestin ku erka hilweşandina nûjentiya netewe dewletê bigire li ser milên xwe. Ev jî bi riya tevgerên xwe yên çandî ku xurt bike û ji çanda netewe dewletê qut bike, ku di wateya ramyarî, aborî û xweseriyê de zêdetir bi hêz dibe û avakirina neteweya demokratîk gengaz dibe. Ev tê wateya ku netewe dewlet bê derbaskirin û neteweya demokratîk bê avakirin; pêwîst e bajar û herêmên xweser pêş bikevin.

Hewl tê dayîn ku pêkhateyên jihevketî yên navendîperest ên netewe dewletê, ji ber tengavkirina sermiyana cîhanî ji aliyekî ve û tevgerên çandî ji aliyê din ve ku dijîn, herî zêde bi rêveberiyên bajar, navçe û herêman ve werin dagirtin. Ji ber vê yekê, ev tevger divê bi tevgera neteweya demokratîk re di nava hev de pêş bikevin.

Neteweya demokratîk, weke şêweyekî rêveberiyê, pir nêzî konfederalîzmê ye.

Konfederalîzm jî, weke cureyeke şêweyê rêveberiya ramyarî ya neteweyên demokratîk e. Bajarên bihêz û xurt,

dikarin tenê bi rêveberiyên xweser ên navçe û herêman ve hebûna xwe pêk bînin. Divê her du tevger jî, di warê şêweyê rêveberiyê de wekhev bin û li rastî hev werin. Netewebûna demokratîk, bêyî hebûna xweseriyên bajar, navçe û herêman, nikare bibe hêza rêveberiyê. Ji ber ku yan wê bikeve nava aloziyê û belav bibe, yan jî wê bi modeleke nû ya dewletperestiya-netewe re were derbaskirin. Tevgera neteweya demokratîk, ji bo ku nekeve nava vê rewşê, neçar e ku xweseriyên bajar, navçe û herêman bi awayekî tekûz pêş bixe. Li beramberî vê, rêveberiyên xweser ên bajar, navçe û herêman, ji bo ku bi tevahî neyên daqurtandin û karibin hêzên xwe yên aborî, civakî û ramyarî bi kar bînin, pêdiviya wan bi vê yekê heye ku bi tevgera neteweya demokratîk re bibin yek. Tenê bi peymanên saxlem ên di navbera xwe de dikarin wan yekdestên hêza navendîperest ên tundraw(radîkal) derbas bikin.

Eşkere ye ku pêwîst e mirov pir hişyar be, ji bo ku lîberalîzm van tevgerên demokratîkbûnê di bin serweriya xwe ya bîrdozî û heyberî de pûç û pişaftin neke, weke ku di dîroka xwe de pirî caran wisa kiriye. Erka herî girîng a stratejîk a nûjentiya demokratîk ew e ku hem tevahiya hêzên dijberî pergalê, hem herikîna bi pêkhateyên ramyarî yên civaka dîrokî yên bajar, navçe û herêman re bi pêkhateyeke nû ya bîrdozî û ramyarî, her wiha bi xebatên berfireh ên teorîk di nava hev de pêş bixe.

Îro jî merc destdayî ne, ji bo ku encama pêkhateyên konfederal ên ku ji aliyê dewletperestiya-neteweyê ve di nîvê sedsala 19. de hatine pişaftin, neyê dubarekirin; careke din di sedsala 21. de berovajî, ji bo serkeftina konfederalîzma demokratîk were veguherandin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Navendîperestiya çors a ku weke rewişta yekdestperestiya nûjentiyê hatiye dîtin, bi çi awayî hatiye sepandin û rêkûpêkirin?

2- Çi ji tevgerên xweser ên bajar, navçe û herêman hatiye xwestin, da ku avakirina neteweya demokratîk gengaz bibe?

3- Çima ji pêkhateyên jihevketî yên navendîperest ên netewe dewletê hatiye xwestin ku bi rêveberiyên bajar, navçe û herêman ve werin dagirtin?

4- Neteweya demokratîk, weke şêweyekî rêveberiyê şîrove bike.

5- Çima netewebûna demokratîk, bêyî hebûna xweseriyên bajar, navçe û herêman, nikare bibe hêza rêveberiyê?

6- Erka herî girîng a stratejîk a nûjentiya demokratîk, diyar bike.

WANE 4

ERKÊN REWŞENBÎRIYÊ

Rewşenbîr; kesên ku di beşeke taybet a zanist, teknîk û çandê de xwedî zanîn û perwerdeyê ne. Erkên rewşenbîran, pêşxistina ji aliyê hişmendiyê ve ye. Peywendiya di navbera çêkerên pergalê û hişmendiya rewşenbîran de weke peywendiya di navbera laş û giyan de ye.

Qeyrana laş, weke pêkhateyekê, ne tenê qeyrana hişmendî, weke ku giyan pêwîst dike; qeyran ne di laş de ye; di giyanî de ye. Ev tê wateya ku derbaskirina pergalan, bi şoreşên rewşenbîriyê re gengaz e.

Şoreşa yekem a herî mezin a rewşenbîriyê, di pevajoya 6000-4000 sal B.Z. de li Mezopotamyayê hatiye jiyankirin. Ev pevajoya ku cara yekem bi şêweyekî berfireh, civak û hêzên xwezayî tên şopandin û encamên pratîkî yên piralî derxistiye holê. **Gordon Childe** ji bo vê dibêje; mirov dikare encax hevrûkirina wê bi Ewrûpaya piştî sedsala 16. re bike. Beşeke mezin a destkeftiyên civakî ku hîn jî weke hem hişmendî, hem jî amûr tên jiyankirin, ji wê serdemê ve mane.

Duyem şoreşa mezin jî, demên damezirandina şaristaniyên Sumer û Misirê ne, ku gelek destkeftiyên wan di dîrokê de hatine vedîtin. Weke; hişmendî, amûr, nivîs, bîrkarî, wêje, bijîşkî, stêrnasî, xwedanasî û biyolojî; pêşketinên rewşenbîrî ne, ku di vê demê de hatine bidestxistin. Dîrok piştre wê bi fêrbûn û dubarekirina van pêşketinan re derbas bibe, ta şoreşa Grekê.

Şoreşa sêyem 600 P.Z. şoreşa Grek e. Ji têkelhevbûna ol û mîtolojiyê, derbasî felsefê bûye. Ev rewş, ta sedsala 16'an berdewam kiriye. Derketina olên yek xwedayî jî, şoreşên hişmendiyê yên girîng in. Derketina Zerdeşt jî, şoreşeke sincî ye.

Li Çînê; Konfuçyus, li Hindê; Buda, her wiha sedsalên 8-12 yên îslamê; pêvajoyên girîng ên rewşenbîriyê ne. Şoreşa rewşenbîriyê ya li Ewrûpayê, di sedsala 16'an de ronak bû, vejîn(ronesans) û nûsaziyê(reforman) dest pê kiriye. Ev rêwş, ta sedsala 19'an berdewam kiriye. Lê dema ku digihîje sedsalên 19 û 20'an, hegemoniya dewletê; weke di her qada civakê de bûye, bandora xwe li rewşenbîriyê jî kiriye.

Vê rewşê, derbeyeke giran li rewşenbîriya serbixwe daye. Zanîngeh, ketine rewşa perestgehên netewe dewletê. Giyan û mejiyê nifşê nû, di van zanîngehan de hat şûştin. Ji her demê zêdetir, hemwelatî di van perestgehan de bûn koleyê xweda netewe dewletê.

A girîngtir, bi pêşketinên di cewhera şoreşa rewşenbîriyê ya Ewrûpayê de pêwîst e mirov diyar bike ku beriya her tiştî rewşenbîran; ol, zanist, felsefe û hunerên demên beriya xwe baş têgihîştine. Eşkere ye ku tevkariyên xwe dispêrin vê têgihîştinê. Divê were pejirandin ku rewşenbîrên Ewrûpayî, di warê xwenêzîkirina rastiyê de qonaxeke mezin bi pêş de çûne. Serkeftina wan, weke rêbaz û sepan jî misoger e. Bi taybetî, serkeftina wan a der barê xwezaya yekem (dûrî desthilatdariya dewletê), qadên fizîk, kîmya, biyolojî û stêrknasiyê de bi vî awayî ye. Lê, ne gengaz e ku mirov heman mijaran ji bo nêzîkatiya wan a zanist, felsefe, huner û sinc ên der barê civakê de ku xwezaya duyem in, destnîşan bike.

Belavok(danezan), pisporên zanistî, dibistanên felsefeyê, cureyên huner û rêgezên sincî yên mezin û watedar pêş xistin. Lê nikarîbûn ew qas serkeftî bin, bi qasî ku karibin rewiştên sincî û polîtîk ên civakê biparêzin. Berovajî, her ku bi yekdestên sermiyan û desthilatdariyê ve hatin girêdan, civaka sincî û polîtîk ji xwe re kirin armanc ku wê bigihêjin ta asta tunekirinê. Bi vî awayî, qeyrana rewşenbîriyê dest pê kiriye.

Ji Nû Ve Sererastkirina Qada Rewşenbîriyê

Hewldanên rewşenbîrî û xebatên li ser zanîn û zanistê, divê di nava civaka sincî û polîtîk de bên pêşxistin. Ev rastiya civakê ya ku bi dirêjahiya dîroka şaristaniyê ve hatiye birîn û her ku çûye hatiye tunekirin, di dema nûjen a ku kapîtalîzmê mohra xwe lê daye de bi tevahî hatiye parçekirin. Wê demê, neçar e ku armanca xebatên rewşenbîriyê, çalakiyên zanîn û zanistê; ew bin ku beriya her tiştî, vê rêveçûnê bidin rawestandin. Civakeke di vê rewşê de eger naxwaze bi tevahî tune bibe, neçar e ku li hemberî nûjentiya kapîtalîst li ber xwe bide(bi hemû hêmanên wê ve). Berxwedan, êdî bi heyînê re di heman astê de ye û wekhev e.

Neçar e zanista ku were pêşxistin, beriya her tiştî weke "zanista civakî" were birêkûpêkirin. Zanista civakî, weke dayîka tevahiya zanistan e. Lê ne zanistên din ên der barê xwezaya yekem de (fizîk, stêrknasî, kîmya û biyolojî), ne jî zanîn û zanistên din ên mirovî (wêje, felsefe, huner, aborî û hwd.) qet nikarin pêşengiyê bikin û girêdana watedar bi rastiyê re çêkin. Ev her du qad, tenê dema ku girêdana xwe bi zanista civakî re bi awayekî serkefti çêkin, wê demê dikarin para xwe ji rastiyê bigirin û divê ya bingehîn ew be ku zanista civakî, weke mijara xwe ya sereke, civaka sincî û polîtîk be. Her wiha, cihên bingehîn ên lêkolîna saziyên fermî, di serî de zanîngeh, ên şaristanî û nûjentiyê, ne yên wan bin. Ji ber ku desteserkirina zanistê û hilberandina wê ya di saziyên fermî yên dewletê de hem di paşerojê, hem jî roja me ya îro de tê wateya windabûna girêdana wê ya bi rastiyê re. Çawa ku jina li malên taybet, an jî li yên giştî were ragirtin; çi qas rastiya xwe ya azad û kesayeta xwe winda bike, zanist û rewşenbîrên ku li saziyên fermî jî bên ragirtin; ew qas azadiya xwe û nasnameya xwe ya rastîn winda dikin. Bêguman, ev nayê wateya ku di van saziyan de qet rewşenbîr nayên gihandin û zanist nayê hilberandin. A ku pêwîst e bê têgihîştin ew e, ku zanist û rewşenbîrên ku bibin desthilatdar; wê ji armanca xwe ya vedîtin û lêkolîna li ser rastiya civakî qut bibin.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Rewşenbîr, pênase bike û erkên wan diyar bike.

2- Şoreşa yekem a herî mezin a rewşenbîriyê, diyar bike.

3- Çend vedîtinên demên damezirandina şaristaniyên Sumer û Misirê, binivîse.

4- Çawa şoreşa rewşenbîriyê ya li Ewrûpayê, di sedsala 16'an de dest pê kiriye?

5- Çawa qeyrana rewşenbîriyê dest pê kiriye?

6- Çi ji civaka ku hatiye parçekirin û naxwaze bi tevahî tune bibe, tê xwestin?

7- Çima cihên bingehîn ên lêkolîna saziyên fermî, di serî de zanîngeh, ne di destê şaristanî û nûjentiyê de bin?

WANE 5

ERKÊN SINCÎ

Immanuel Kant(1724-1804)

Hêsan e ku mirov sinc, weke têgehekê pênase bike. Dema ku mirov zanibe li gorî gerdîş û rêgezên civakî çawa bijî, dibe ku ev bibe pênaseya sinc. Lê ev ravekirin şêweyî dimîne. Dahûrînên ku feylozofên demê kevn û demên nû **(Eflatûn, Arîsto û Kant)** di bin navê “etîk” de kirine û dibêjin; divê kes ji civakê qut bibe û bi dewletê ve were girêdan. Eşkere ye ku nêzîkatiyeke wisa pêşkêş dikin, weke ku erka sinc ew be ka wê mirov ji bo dewleta xwe çawa bike. Bi kurtasî, şîroveyên wan ên li ser sinc; alîgirên şaristaniyê ne.

Serlêdana li dîrokê, weke ku di hemû mijarên civakî de dibe, der barê sinc de jî wê zêdetir fêrkar û bisûd be. Em dizanin ku di serdemeke dirêj a weke ji sedî 98 demên civakî de rêgezên hiqûqî na, yên sincî derbasdar bûne. Ji ber vê sedemê jî, em dibêjin her tim daxwaza me civaka sincî ye. Mirov dikare sinc; weke riya herî baş a bidestxistina aboriyê, ya rastir, weke riya herî baş a bidestxistina pêdiviyên bingehîn ên jiyanê pênase bike. Sinc; weke tore û şêwaz, awayê bidestxisina aborî, yan jî ya pêdiviyên bingehîn e. Sinc, tê wateya bi şêwaza baş pêkanîna hemû çalakiyên civakî, di serî de hewldanên ji bo aboriyê. Ji ber vê yekê, her tiştê ku civakî be, sincî ye jî. Her wiha, her tiştê ku sincî be, civakî ye jî. Her wiha, çawa ku aborî; sincî ye, ol jî; sincî ye û ramyarî weke demokrasiya rasterast; sinc bi xwe ye. Lê bi pêşketina şaristaniyê re qada sinc hatiye tengkirin û li şûna wê hiqûqa ku berjewendiyên sermiyanê diparêze hatiye bicihkirin. Tengkirina qada sinc, tê wateya tengkirina qada demokrasiyê.

Çawa ku di navbera demokrasî û sinc de peywendî heye, di navbera ol û sinc de jî heye. Di rewşên ku ol neketiye bin bandora şaristaniyê de sinc, ol û demokrasî rasterast di nava hev de jiyan dikin. Sinc, saziyeke ku beriya olê ava bûye ye.

Ol, saziyeke beriya şaristaniyê ye. Her çi qas ol ji nava sinc derketibe û beşeke wê pêk aniye jî, lê bi guherîna mercên dem û cih re veguheriye saziyeke bihêz û tund ku neçar e zagonên wê bên pêkanin û bi vî awayî xwe ji sinc cuda kiriye. Bi pêşketina şaristaniyê re têgeha xwedabûnê jî pê re pêş ketiye. Ev rewş, di asta sinc de şikandina yekem e û şikandina duyem jî bi destê dewletê bi riya avakirina hiqûqê re ji bo parastina berjewendiyên yekdestan e.

Ol, bi vê rewşa xwe du nasnameyan werdigire:

1- Weke nasnameya şaristaniyekê; ji bo rewakirina dewlet, desthilatdarî û çewisandinê hatiye bikaranîn.

2- Weke nasnameya xwe ya sincî û polîtîk; bexşîn, dilovanî, hezkirin, rêzgirtin, aştî, hêvî û wêrekiyê diyar dike.

Olên Îbrahîmî, van her du taybetmendiyan jî di nava xwe de hildigire. Di ola Zerdeştî de aliyê sincî zêdetir li pêş e. Ji bo vê jî, ji xwedayên (bi awayê putan) Sumeran re dibêje; “Tu kî yî?” Bi vê gotina xwe, ji aliyê putperestan ve tê darizandin. Manî û Halaci Mansûr jî minakên vê ne. Di serdema navîn de em di îslam û xirîstaniyê de jî rastî şopên sinc tên û di serdema nûjentiyê de bi giştî sinc hatiye hilweşandin.

Erkên Sincî

1- Ji nû ve avakirina civaka sincî û polîtîk.
2- Divê civaka sincî û polîtîk; tevî hemû hewldanên (ji aliyê hêzên şaristanî û nûjentiyê ve) pûçkirin û tunekirinê, hebûna xwe weke xwezaya civakî bidomîne.
3- Di civakê de tengkirina qada hiqûq û firehkirina ya sinc.

4- Divê cihên perestinê; di serî de dêr û mizgeft, weke saziyên pratîk ên sincî bên nirxandin û di avakirina civaka sincî de bên bikaranîn.

5- Divê mirov dema ku bikeve xefka olperestiya laîsîzmê, oldariya nerm û radîkal, aliyên azad ên ji naveroka wê ya demokratîk bipejirîne û li gorî wê nêzîk bibe.

6- Sinc; bingehîn e, hiqûq; di rêza duyem de ye.

7- Divê konfederasyona hîndekariya sincî û pîroziyên cîhanî, weke pêdiviyekê werin damezirandin li hemberî cinawirên şaristanî û nûjentiyê, ku hewl didin hemû pîroziyan û nirxên sincî daqurtînin.

A girîng ew e ku civak û mirov, xwe bi sincê baş rapêçin.

Tevî ku cinawiriya şaristanî û nûjentiyê çi qas êrîşî civaka sincî dikin û hewl didin wê tune bikin; em jî neçar in, wê biparêzin. Mirovên ku nikaribin civaka xwe biparêzin, nikarin mafê xwe yê jiyana birûmet bijîn. Lê eger sinc nebe, mirov nikare parastina civakê jî bike. Serkeftina ku hemû beşên civakê di xebatên ji nû ve avakirina nûjentiya demokratîk de nîşan bidin, dibe pîvana bingehîn a derketina bi serkeftî ya ji qeyrana cîhanî ya pergalê.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Sinc, weke têgeh pênase bike.

2- Dahûrînên ku feylozofên dema kevn û nû di bin navê “etîk” de kirine û li ser pênaseya sinc çi gotine?

3- Çima her tim dibêjin, daxwaza me civakeke sincî ye?

4- Têkiliya di navbera ol û sinc de diyar bike.

5- Çima Zerdeşt ji aliyê putperestan ve hatiye darizandin?

6- Erkên sincî, diyar bike.

7- Çima hatiye xwestin ku civaka sincî her tim were parastin?

WANE 6

ERKÊN POLÎTÎK

Her çi qas polîtîka, peyveke Yewnanî be û wateya xwe rêveberiya bajar be jî, lê di civaka demokratîk de tê wateya ji bo karên rojane yên hevbeş. Lê eger wateya bingehîn a polîtîkayê, weke hunera azadiyê were destnîşankirin, dibe ku armanc bêhtir tê ravekirin. Azadî bi xwe jî, nêzîkatiya li rastiyê tîne bîra mirov. Bêguman, dema ku em têgehên weke; polîtîka, azadî û rastiyê bi kar tînin, ev tê wateya civaka sincî û polîtîk. Erka sinc; ew e ku karên jiyanî bi awayê herî baş bike, erka polîtîkayê jî; ew e ku karên herî baş peyda bike.

Pêwîst e were têgihîştin ku karûbarên dewletê, ne karên polîtîkayê ne, lê karên rêveberiyê ne. Dewlet, bi polîtîkayê nayê kirin, lê pê tê birêvebirin û karên ku bi berjewendiyên jiyanî yên civakî re têkildar nebin, polîtîkaya bingehîn pêk nayê û di asta karên rojane(rûtîn) de ne, ku ji aliyê saziyên din ên civakî ve tên bicihanîn. Divê were zanîn, karên ku girêdana wan bi azadî, wekhevî û demokrasiyê re nebe, di bingeh de polîtîkayê peywendîdar nakin: lê berovajî vê yekê polîtîka, berjewendiyên jiyanî yên civakê, jîndarî û ewlekariya wê, her wiha demokrasî, azadî û wekhevî ne ku ji aliyê desthilatdar û dewletê ve tên astengkirin. Weke tê dîtin, karên polîtîk û karên dewletê, ne weke hev in. Her wiha, bi hev re pir bi nakok in. Di vê rewşê de dewlet çi qas fireh û kûr bibe, polîtîka jî ew qas teng û sist dibe. Dewlet; tiştên amade bi rê ve dibe, lê polîtîka; diafirîne, çêdike û bi rê ve dibe. Dewlet; pîşe ye, lê polîtîka; huner e.

Her çîn, bajar, gel, qebile, komên olî û neteweyên ku nikarin polîtîkayê bikin, an jî nayê hiştin ku polîtîkayê bikin; tê wateya ku hêza viyan û gotinên wan derbeyeke mezin xwariye. Li cihê ku gotin û viyana hevbeş nebe jî, li wir bêdengiya mirinê heye.

Li gorî ku desthilatdar hewl dide civakê; bike mêtingeh, polîtîka jî hewl dide ku civakê; qezenc û azad bike. Yan jî li gorî ku desthilatdarî; bîrdoziya lîberal, pîşesazî û dewleta neteweyî

ava dike, divê polîtîka jî; bîrdoziya azadî, jîngeh-pîşesazî, civaka komînal û konfederalîzma demokratîk hilberîne û wan ava bike. Li gorî ku desthilatdarî; di asta her mirov, pêkhate, bajar, gund, navçe, herêm, netewe, parzemîn û cîhanê de xwe birêxistin dike, polîtîka jî; neçar e xwe di asta her mirov, bajar, navçe, herêm, netewe, parzemîn û cîhanê de birêxistin bike.

Rêgezên Giştî Yên Erkên Polîtîk

1- Xwezaya civakî, di bingeha xwe de çêbûneke polîtîk û sincî ye. Civaka ku taybetmendiya xwe ya polîtîk û sincî winda bike, bi neçarî di warê rizîn, belavbûn û tunebûnê de dimîne.

2- Hizirîna civakan, li gorî şêweyên pêşketinê ku hatine awayê xeta rast, weke ku bi navê civaka xwezayî, koledar, feodal, kapitalîst û sosyalîst şaş e û bêhtir xizmeta zextan dike û rastiyê jî winda dike. Lê dema ku ji hev du cuda bibin, bi awayê civakên desthilatdar, têkildar û civakên demokratîk rastir e.

3- Bi qasî ku qada desthilatdariyê fireh bibe, qada polîtîkayê jî, teng dibe. Ji bo vê, hêzên deshilatdar û têkildar, qada xwe fireh kirine û qada polîtîkaya civakê jî teng kirine.

4- Xweparastin, weke hêzeke leşkerî ji bo parastina civak û polîtîkayê, bi awayekî domdar pêwîst e.

5- Di dîrokê de bi pejirandina hêzên şaristanî, demokratîk û rêzgirtina ji nasname û berjewendiyên hev du re aştî pêk tê.

6- Desthilatdar û netewe dewlet ku formên bingehîn ên dewletê ne, her tim bi civakê re di nava şerê domdar de ne. Polîtîkaya berxwedanê, çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire.

7- Konfederalîzma demokratîk, şêweyê bingehîn ê polîtîk a nûjentiya demokratîk e û di xebatên ji nû ve avakirinê de risteke jiyanî dilîze. Konfederalîzma demokratîk, navgîna

herî guncav a hilberandina çareseriya ramyarî ya demokratîk e.

8- Azadî, wekhevî û demokrasî; tenê bi hêza gotûbêj, biryar û çalakiya civakê ve gengaz in, ku bi hêza xwe ya hişmendî û wijdana xwe ya cewherîn ve wan pêş bixe.

9- Di neteweya demokratîk de her etnîsîte, baweriyên olî, bajar, herêm û netewe xwedî maf in ku bi nasname û çêkera federal a demokratîk re cihê xwe tê de bigire.

10- Hêzên nûjentiya kapîtalîst û hêzên nûjentiya demokratîk; li ser bingeha pejirandina heyîn û nasnameyên hev du û venasîna rêveberiyên xwe yên xweser ên demokratîk re dikarin bi hev du re di nava aştiyê de bijîn. Çawa ku ev yek, di navbera hêzên şaristanî û hêzên demokratîk de di dîrokê de pirî caran pêk hatiye. Pêkhateyên ramyarî yên konfederal ên demokratîk û pêkhateyên netewe-dewletê dikarin di bin van mercan de di nava û li derveyî sînorên netewe dewletê de bi hev du re di nava aştiyê de bijîn.

PIRSÊN NIRXANDINÊ

1- Polîtîkayê, pênase bike.

2- Çi cudahî di navbera polîtîka û karên dewletê de heye?

3- Dema ku her çîn, bajar, gel, qebile, komên olî û netewe nikaribin polîtîkayê bikin, tê çi wateyê?

4- Li gorî hewldanên desthilatdariyê ku di civakê de tê sepandin, erka polîtîkayê diyar bike.

5- Çend rêgezên giştî yên erkên polîtîk, binivîse.

6- Çawa hêzên nûjentiya kapîtalîst û nûjentiya demokratîk dikarin bi hev du re di nava aştiyê de bijîn?

FERHENGOK

Aborî-Polîtîkaya Îngilîz: Serkeftina dewletê, bi serkeftina aboriya wê ve girêdayî ye.

Aleksander Kerensky (1881-1970): Di dema şoreşa Rûsyayê ya 1917'an de Serokê Komara Rûsyayê bû.

Anarşîst: Mirovên ku tu desthilatdar û serweriyê napejirînin û li dijî zagonan tevdigerin.

Bolşevîk: Di rûsî de tê wateya pirbûnê, baskê çepê yê alîgirên Lênîn di sala 1903’yan partiya kar a sosyalîst û demokrat a Rûsyayê de ev nav li xwe kirin û artêşek bi navê artêşa sor saz kirin.

Burjûwazî: Çîna zadeganên bajarî ye, di sedsalên 15 û 16'an de çêbûye, xwedî sermiyan û pîşezaziyê ne, serdestiyê li ser hilberîn, civak û saziyên dewleta kapîtalîst dikin.

Çerez: Tiştên hişkirî yên weke; dendik, qidamk, fisteq û hwd.

Çewisandin: pelixandin, zextkirin, tepisandin

Dewleta emperyalîst: Dewleta ku bi riya bikaranîna hêza leşkerî, yan jî destlêwerdana aborî û ramyariyê; serdestî û desthilatdariyê li ser dewleteke din dike.

Dên Bên Fo(Dien Bien Phu): Navê şerekî ku di sala 1954'an de di navbera Fransa û Vietnamê de çêbûye û tê de Vietnam bi ser ketiye.

Ehlibeyt: Mirovên ku koka wan digihîje malbata Hz. Mihemed.

Ekolojî: zanista hawirdorê, xwezanasî, hawirdornasî,
Emperyalîzm: Ramyariya ku bi kotek û zorê gelekî ji aliyê siyasî û aboriyê ve dixe bin serweriya xwe û berbelav dibe. Berbelavbûn.
Etîk: Sincnasî, zanista ku rêgez û nirxên sincî yên mirovan lêkolîn dike.
Immanuel Kant (1724-1804): Feylosofekî Elman e, ji çanda Ewrûpayê ya nûjen bandor bûye û teoriya zanîna klasîk nivîsandiye.
Îronî: Vegotina pêkenokî, an jî tinazokî ya ku bi awayê ne rasterast tê gotin.
Îstasyon: Rawestgeh, navendên lêkolînê, cih û dezgehên ku karên weke; firotin, venêrîn û hwd. lê tên kirin.
Fanatîk: Mirovê ku bi kes, an jî tiştekî ve pir zêde, yan jî bi dilsozî girêdayî ye.
Faşîzm: Pergaleke ku civak û hemû tiştên wê ji dewletê re ye, tiştek li dijî û beyî dewletê nabe.
Felsefeya Elmanya: Divê dewlet, bi awayê dewleta neteweyî be.

Gelê Laz: Gelê ji Kafkasyaya Başûr e, xwedî çand û zimanekî serbixwe ne, bi taybetî li herêma Deryaya Reş jiyan dikin.
Glasnost: Tê wateya ku divê hemû kar û çalakiyên saziyên dewletê, zelal û vekirî bin û xwestina agahiyan bi awayekî serbest be.
Gelê Necîb: Gelê malmezin, endamên çîna bilind, an jî serdest a civakê.
Hegemon: serdestî, zordarî, desthilatî, serwerî
Hegel (1770-1831): Feylesofekî Elman e, yek ji damezirînerê felsefeya îdeal a Elmanyayê ye.
Kapîtalîzm: sermiyandarî
Kapîtalîzma bazirganî: Di sedsala 16'an de li Ewrûpayê derketiye. Piştî hilweşandina pergala feodal, çîna bazirgan a ku yekdestiyê li ser bazirganiyê dike û zagona dewletê wan diparêze, yan jî destlêwerdana dewletê ya li ser pergala aboriyê ye.
Katolîk: Navê dêra Romayê ye, her wiha ji kesê ku ji mezheba katolîk re tê gotin.
Komagene: Dewleteke bi awayê begtiyê bû**,** nêzî bajarê Semsûr ê li Bakurê Kurdistanê ye (250 B.Z. - 100 P.Z.) û tê wateya welatên eşîrên nîv-koçer. Ev dewlet, li ser Çiyayê Nemrûdê hatiye avakirin.
Komunîzm: Sazûmaniya civakî ye ku tê de milkê taybet tune ye û her tişt bi awayê hevbeş tê bikaranîn. Nêrîna siyasî, civakî û aborî ya ku avakirina sazûmaniyeke wiha ji xwe re dike armanc.
Komintang: Partiya niştîmanî ya Çînî, niha ev partî di dewleta Taywanê de ya sereke ye.
Laz: Navê gelêkî ji Kafkasyayê ye.
Leon Troçkî (1879-1940): Yek ji serwerê şoreşa Rûsyayê ye.
Lîberalîzm: Serbestîtî, felsefeyeke ramyarî ye û xwe dispêre serbestiyê.
Louis Auguste Blanqui (1805-1881): Sosyalîstekî aşopî yê Fransayî ye, di serhildana 1830 û 1848'an de beşdar bûye.
Manîfesto: daxuyanî, beyaname, belavok
Manîfestoya Komunîst: Pirtûkeke ku ji aliyê Marks û Engels ve hatiye nivîsandin. Di vê pirtûkê de rêbazeke dahûranî ya têkoşîna çînên civakî û pirsgirêkên kapîtalîzmê hatiye diyarkirin.
Masonîk: Rêxistineke cihûyan e. Armanca wê; bi navê azadî, wekhevî, biratî û mirovahiyê; serdestiyê li ser cîhanê bike.
Materyalîzma diyalektîk: Bingeha felsefeya Marksîzmê ye, xwe dispêre zagonên diyalektîkê yên felsefeya Hegel.
Morgan (1818-1881): Navê wî Lewis Henry Morgan e, antropoloxekî Emerîkayî ye.
NASA: Bi îngilîzî (National Aeronautics and Space Administration) ya dewleta Emerîkayê ye. Di sala 1957'an de hatiye damezirandin. Armanca wê, lêkolînên li ser fezayê ye.
Paradîgma: Yekbûna ramanên bîrdozî ye.

Peymana Brest-Lîtovsk: Peymana aştiyê ya ku di 3'yê Adara 1918'an di navbera Rûsya û Elmanyayê de hatiye mohrkirin e. Ev peyman, ji bo rawestandina Şerê Cîhanê yê Yekem ji aliyê Rûsyayê ve hatiye derxistin.

Peymana Vestfalya: Vestfalya, kantoneke Elmanyayê ye. Li gorî vê peymanê, li Ewrûpayê hemû şerên olî tên rawestandin û sînor di navbera hemû dewletên neteweyî de tên xêzkirin.

Peymana Yalta (11.2.1945): Di vê peymanê de serokê Emerîka, Brîtanya û Rûsyayê li ser parçekirina Elmanyayê dicivin û Elmanya tê parçekirin.

Prestroyka: Tê wateya ji nû ve avakirina aboriyê.

Propaganda: Bangeşe, agahiyên ku der barê kes, partî, hêz û hwd. de tên belavkirin.

Protesto: Li dijî kes, tişt, feraset, nêzîkatî, yan jî rewşekê bûyîn e. Nerazîbûn, şermezarkirin, nepejirandin.

Protestan: Peyveke îngilîzî ye û tê wateya kesê ku napejirîne û dijberiyê dike. Mezhebeke ola xirîstiyaniyê ye ku nûvesaziyê dixwaze. Taybetmendiyeke vê baweriyê, tenê pirtûka pîroz (Încîl) weke çavkaniya xirîstiyaniyê dipejirîne, kevneşopiyên olî napejirîne.

Robert Owen (1771-1858): Reformîstekî civakî ye, ji dewleta Wîlz e, bingeha sosyalîzma îdeal damezirandiye.

Romanov: Malbata duyem û dawî ya ku Rûsyayê bi rê ve dibe. Piştî malbata Rorîk, ji sala 1613'yan ta 1917'an.

Saint Simon (1760-1825): Feylosofekî Fransayî û ji Parîsê ye. Her tim dixwaze di jiyana aborî de destlêwerdana dewletê hebe, rêzdariyeke taybet dide pîşezaziyê.

Serhildana Yolyo: Şoreşa ku li dijî qralê Fransayê yê bi navê Şarilê Dehem derketiye, dixwest pergala dewletê veguherîne monarşiyê.

Seferberî: Dema ku dewlet ji gel re biryarekê radigihîne, da ku hemû gel bikevin bin xizmeta parastina dewletê. Dema ku her tişt li gorî rewşa şer tê amadekirin.

Sosyalîzma Aşopî Ya Fransayê: Divê rista olê ya di pergala dewletê de nebe û pergal laîk be.

Şerê sar: Şerê ku bi awayekî veşartî di navbera du dewletan de di warê pêşketina çekan de tê kirin, da ku kîjan ji van dewletan serdestiyê li ser cîhanê bike. **Mînak:** Emerîka û Rûsya.

Şerê Sîdanê: Ev şer, di sala 1870'yî di navbera Fransa û Elmanyayê de çêbûye, tê de împaratorê Fransayê Louis Bonapart dîl hatiye girtin.

Şoven: Ji navê leşkerekî Napolyon Bonapart, Nicolas Chauvin hatiye wergirtin. Ji ber ku bi awayekî mezin û tund, li hemberî kesên dijber, parastina pergala Napolyon kiriye.

Thomas Moore (1478-1535): Serwerekî ramyarî û zanyarekî îngîlîz e.

Totalîtarîzm: Tê wateya ku hemû qadên jiyanî, ramyarî, aborî, civakî û hwd. di bin pergala dewletê de ne.

BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

HEFTE / MEH	HEFTEYA YEKEM	HEFTEYA DUYEM	HEFTEYA SÊYEM	HEFTEYA ÇAREM
Rezber			Çand û sincê netewe-dewlet û têkçûna sinc	Çanda neteweperestiyê
Cotmeh	Çanda malkirinê	Çanda ezezî û têkçûna sincê civakî	Çanda populer	Çanda seks, huner û werzîşê
Mijdar	Çanda sanal	Çanda medyayê û emperyalîzma çandî	Sosyalîzma zanistî	Şoreşa Rûsyayê 1
Berfanbar	Şoreşa Rûsyayê 2	Tevgerên rizgariya neteweyî	Şoreşên rizgariya neteweyî	Di civaka kurdan de çand û sinc
Rêbendan	Di dema şaristaniya koledar de kurd	NIRXANDIN	BÊHNVEDAN	BÊHNVEDAN
Reşemeh	Di şaristaniya feodal de kurd	Di şaristaniya kapîtalîst de kurd-1	Di şaristaniya kapîtalîst de kurd-2	Çanda berxwedan û xiyanetê
Avdar	Çanda neteweya demokratîk-1	Çanda neteweya demokratîk-2	Rêgezên neteweya demokratîk	Tevgera etnîsîte û neteweya demokratîk
Cotan	Zîndîbûna kevneşopiya olan; tevgerên olî û çandî	Tevgerên xweser ên bajar, navçe û herêman	Erkên rewşenbîriyê	Erkên sincî
Gulan	Erkên polîtîk	NIRXANDIN		